## Dengbêjê mezin Huseynê Farê

Dengbêj Huseynê Farê ku ji malbateke dengbêj tê bi stranên 'Xalê Cemîl' û 'Têlî' şewatê bi dilê mirov dixe, wekî gelek dengbêjên kurd jiyaneke zor û zehmet derbas kir û bi stranên xwe ve xizmetî çand û zimanê kurdî kir. Huseynê Farê di nav kurdan de dengbêjekî navdar e û bi taybet jî li derdora herêma Amedê tê zanîn... *RÛPEL - 9*



## Di warê sosyolîk de xuliqîna rêxistinekê...

Beriya avabûna PKK'ê jî kurd di nava têkoşîneke neteweyî de bûn. Ango têkoşîna neteweyî di nava kurdan de bi PKK'ê dest pê nekir. Lê bi avabûna PKK'ê re navê kurdan û têkoşîna wan li her dera cîhanê belav bû û di asta navneteweyî de kurd hatin axaftin...

*Nivîsa Mihemed RONAHÎ* - *R.2*



# 'PKK HÊVIYA GELÊ KURD E'

Yek ji sazûmankarên PKK'ê Cemîl Bayik bi munasebeta salvegera avakirina PKK'ê axivî. Bayik got gelê kurd hêviyên xwe di PKK'ê de dîtine û lewre piştgiriyê didê


# ROJEV

25 Mijdar - Çarşem 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 13


## PKK babîzoka kurdê birîndar e

Mijdar li Kurdistanê di nava şevên payîzan de bi xirecir û lihevnekirina demsala payîz û çileyê ye. Di wan salên beriya PKK'ê de gelê kurd di nabira her du demsalan de bi ponijandin êş û azaran re derbas dikir û bêçar e û kizirandî bû. Di mijdara 1978'ê de dengvedanekê ji gewriyan olan da...

SERKEFT BOTAN - R.2



### EV TEVGER BÛYE MALÊ GELÊ KURD

Yek ji sazûmankarên Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) û Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik 31'emîn salvegera damezirandina PKK'ê nirxand û got ku PKK'ê vejîna netewî daye. Bayik planên tasfiyekirina PKK'ê jî nirxandin û got hewldanên pûç in, ji ber ku PKK bûye malê gel û mirovahiyê...

*HEVPEYVÎN* - *RÛPEL 8*

# Li gorî Erdogan faşîst mafdar in

Piştî êrîşa komeke faşîst a li dijî DTP'ê nîqaşên li ser mijarê berfireh bûn. Li gorî Erdogan DTP'ê gelê Îzmîrê tahrîk kiriye û lewre êrîş pêk hatiye. Li gorî Bahçelî jî AKP'ê êrîş organîze kiriye. Rayedarên DTP'ê û saziyên kurd bi zimanekî tund helwesta hikûmet û Walîtiya Îzmîrê rexne kir

### ERDOGAN DÎSA KURD KIRIN HEDEF

Serokwezîrê Dewleta Tirk Recep Tayyîp Erdogan careke din DTP hedef nîşan da û êrîşên nijadperestan ên li hemberî konvoya DTP'ê rewa dîtin. Parlamentera DTP'ê ya Amedê Aysel Tugluk got: "Heke kurd jî kesê negirin Amedê wê demê dê çi bibe? Divê dest ji neyartiya kurdan bê berdan."

### 'NIKARIN ALA KURDAN QEDEXE BIKIN'

Parlamenterê DTP'ê yê Şirnexê Hasîp Kaplan jî bi zimanekî tund bertek nîşanî gotinên Erdogan da û wiha got: "Ne Serokwezîr û ne jî tu kesê din nikare ala me ya ku rengên wekê kesk û sor û zer in qedexe bikin. Dema mirov li Erdogan guhdarî dike mirov dibêje aqlê xwe xwariye."

### JI AHMET TURK MÎNAKA MANDELA

Her wiha Hevserokê DTPê Ahmet Turk, diyar kir ku serokê PKK'ê Abdullah Ocalan muxatab neyê girtin pirsgirêka kurd nayê çareserkirin û destnîşan kir ku li Afrîkaya Başûr Nelson Mandela muxatab nehatiba girtin, pirsgirêka Afrîkayê nedihat çareserkirin... *RÛPEL - 5*



## 'Hikûmet rê li tundiya li ser jinê nagire'



Li Amedê DOKH'ê daxuyaniyek da çapemeniyê. Li ser navê DOKH'ê Perihan KAYA, li ber deriyê Qesra Dadê ya Amedê daxuyanî xwend û got hikûmet pêşî li êrîşan nagire...

JIN R7

## Navên gundan dibin kurdî



Şaredariya Amedê biryara Meclisa Giştî ya Bajar a têkildarî bi kar anîna navên kurdî bi cih tîne. Atolyeya Trafîkê ya Bajarê Mezin tabelayên amade kirîn ên nû li daketina gundan bi cih dike...

POLÎTÎKA R5

## Ji girtiyan re piştgiriya rewşenbîran




Greva birçîbûnê ya girtiyên ji doza PKK'ê û PYD'ê yên li girtîgeha girtîgeha Edra Şamê kete roja 27'an. Ji bo çalakiyê piştgiriyek ji rewşenbîran hat. Rewşenbîrên kurd li Ewropayê ketin greva birçîbûnê...

NÛÇE R8

## Dûrî min here kurdê pîs!

Ev çîrok rastiyê vedibêje. Li ku derê me behsa biratiyê kir, me pehineke mezin li ser dilê xwe dît. Tim biratiyek pozbilind ku tu carî hebûna me qebûl nake para me ket. Lê kurd ne wisa ne. Hezar sal in ku me ew dan ser serê xwe. Dem hat em birçî man, lê me nanê xwe da wan...

*Mem MÎRXAN* - *R 2*



## Rewşa me zilaman û êşa jinan...

Îro 25'ê mijdarê ye. 'Roja Têkoşîna li Hemberî Şîdeta li Dijî Jinê'... Zilamên ku li pey parastina 'iktîdara' xwe digerin, dibe ku bêjin; 'ev ji me kêm bû'... Divê em îtirafêke 'samîmî' bikin. Gelek ji dibêjin, 'weleh-bileh li mala min hikmê jinê serdest e'...

*ADIL ZOZANÎ* - *R. 5*

# YE: Pirsgirêka kurd çareser bike

Tirkiye di rojên dawî de ji gelek aliyan ve rastî rexneyan tê û herî dawî YE'yê di rapora firekirinê de ji Tirkiyeyê xwest ji bo pirsgirêka kurd hewldanên şênber pêk bîne. Di rapora firehkirina Yekîtiya Ewropayê de, ji Tirkiyeyê tê xwestin ku di pirsgirêka kurd de, gavên erênî biavêje. Rapora Firehkirina Yekîtiya Ewropayê ji aliyê parlamentera Yekîtiya Ewropayê Gabriele Albertinî ve hate amadekirin û pêr, di Komisyona Karên Derve de, hat nîqaşkirin... *RÛPEL - 6*

## Kedkarên KESK'î îro li her derê kar radiwestînin




Kedkar îro li tevahiya bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê ji bo rojekê kar radiwestînin. Ji bilî Kamu-Sen'ê hemû konfederasyonên sendîkayan banga tevlibûna grevê li endamên xwe kir. Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan beriya ku biçe Lîbyayê gef li kedkarên ku dê beşdarî grevê bibin kir û got: "Ev çalakî derqanûnî ye. Bila hesaba encamên wê jî bê kirin." Sekreterê Giştî yê KESK'ê Emîralî Şîmşek anî ziman ku gefên Erdogan pere nakin û got ku ew ê di 25'ê mijdarê (îro) de jiyanê bidin rawestandin.

www.arsivakurdi.org

# Ji qoziyeke sosyolojîk afirîneriya rêxistinî

Niha wêjeya kurdî ji bilî kurdî werdigere çend zimanên cîhanê? Niha edîb û şairên kurdan bi zimanê xwe dikarin bi hêsanî, bi edîb û şairên cîhanê re têkevin pêşbaziyê

MIHEMED RONAHÎ *

Di nava civakê de rêxistin û fraksiyonên alternatîf, xwe li ser du xalan ava dikin:

**1-** Fikr û ramanên cuda

**2-** Aîdiyetek dîtir


Ango sedema rêxistinîbûyîn an fraksiyonîzebûyîna kesan,bi du xalan tê diyarkirin: Yan ji ber ku fikr û ramaneke li derveyî wê civakê bi xwe re digerînin xwe bi rêxistin dixin yan jî xwe aîdê wê civakê nabînin û li gorî xwe, ji xwe re qadeke aîdiyetê vedikin û bi vî rengî xwe bi rê dixin. Hema hema di hemû civakên heyî de fraksiyon û rêxistinên cuda hene û ev rêxistin bi awayekî, jiyaneke alternatîf ava dikin ji ferdên xwe re. Lê hemû rêxistin wek hev bandordar nabin. Ji vana gelek têk diçin, hinek jî bi ser dikevin û ji bo ferdên xwe dibin reng û dengê jiyanê.

*Rêxistinên serketî em dikarin di bin du banan de bigirin dest:*

**1-** Yên ku bi xwe re çand û hunereke alternatîf diafirînin.

**2-** Yên ku çand û hunera heyî jî dikujin.

A rastî jî ji rêxistinên serketî hinekan bi çalakvanî û serhildêriya xwe wêjekar û hunermendên hêja afirandine. Wek mînak ji van rêxistinan yek Bolşevîkên Orisî ne. Bi xeta û gunehên wan em dikarin gelek kêmasiyên wan bijimêrin. Lê digel xeletiyên wan, bi xwe re helbestvan û wêjekarên gelek mezin û bilind yên wek Gorkî û Mayakovski afirandine. Dîsa rêxistinên Perû, Arjantîn, Şîlî û Spanyayê yên sosyalîst bi xwe re gelek şair, wêjekar û wênesazên mezin afirandine. Di dîrokê de ji mînakên rêxistinbûyîneke serketî yek jî ya Hz. Muhemed e. Hz. Muhemed di demeke gelek kurt de ji Erebên bedewî yên ku ji sedî sed ji saristaniyê dûr bûn, şaristaneke mezin afirand. Di nava çil pêncî salî de wan bedewiyana anî asteke wisa ku, êdî çand, zanist û huner di-firotin şaristaniyên wek Bîzansê û Sasaniyan.



Ji rêxistinên mezin hemû wek hev ne afirîner in/bûne. Heta hinekan afirînerî û hunermendiya heyî jî bi xwe re kuştine. Wek mînak Hîzbullah'a Îranê ji van rêxistinan yek e. Beriya Hîzbullah'ê li Îranê wêjekarên gelek hêja derdikevin holê. Wek Samed Behrengî, Furûx Feruhzad, Ehmed Şamlû û Sohrap Sepehrî. Lê li dû serketina Hîzbullah'ê wêje û hunera Îranê, çanda Îranê, her diçe sist dibe. Ne Îran tenê, li Çîn'a Mao jî heman rewş derbasdar e, ji bo Talîban'ê jî, ji bo ETA'yê jî heman rewş derbasdar e. Serqisê beriya ETA'yê hunermendê wek Pablo Picasso, Garcia Lorca, Antonio Machado û Rafael Alberti derketin ji Spanyayê, lê li dû ETA'yê em nikarin behsa çand û wêjeyeke bilind bikin.

Niha em werin ser PKK'yê. Beriya avabûna PKK'yê jî kurd di nava têkoşîneke neteweyî de bûn Ango têkoşîna neteweyî di nava kurdan de bi PKK'yê dest pê nekir. Lê bi avabûna PKK'yê re navê kurdan û têkoşîna wan li her dera cîhanê belav bû û di asta navneteweyî de kurd hatin axaftin. Digel vê yekê PKK'yê wek rêxistinekê, bes di warê siyasî û leşkerî de di ber xwe neda. Di heman demê de di warê çandî û hunerî de jî xebateke hêja li dar xist û bi arava vê xebatê kurd bi taybetî li bakurê Kurdistanê di warê wêjeyê, muzîkê û bi taybetî jî di warê zimên de gelek pêş ketin. Heta qadeke wek şanoyê ya hunerî jî dîsa bi vê rêxistinê pêş ket. Lê ya herî girîng bi ya min pêşxistina wê ya zimên bû. Beriya PKK'yê jî zimanekî gelê kurd hebû lê meriv dikare bêje ku zimanekî ber bi cankêşê bû. Bi arava vê rêxistinê kurdî vejiya û di hemû waran de xwe hêzdar kir. Bi çavekî objektîf li sîsaliya PKK'yê binêrin,hetta ne bi çavekî objektîf, bi çavekî neyarî li sîsaliya PKK'yê binêrin, hûn tu tiştekî nepejirînin jî hûn ê afirîneriya wê bipejirînin. Dev ji hemû aliyê wê berdin, ango wek rêxistineke çekdarî û siyasî bihesibînin ku tu fêde negihandiye neteweya kurd. Lê gelo kî yê aliyê wê yê çandî, hunerî û wêjeyî înkar bike. Di nava sî salî de ji neteweya kurd ya ku navê wê qedexe ye, neteweyeke afirîner pêkhanî.

Niha wêjeya kurdî ji bilî kurdî werdigere çend zimanên cîhanê? Niha edîb û şairên kurdan bi zimanê xwe dikarin bi hêsanî, bi edîb û şairên cîhanê re têkevin pêşbaziyê. Gelê kurd yê ku beriya sî salan nikaribû bêje ez kurd im, niha li kolanan aşkera doza maf û azadiyê dikin. Di warê muzîkê de ji gelek neteweyên cîhanê yên desthilatdar bêtir berheman diafirînin kurd. Di warê sînemayê de hewldanên hêja pêk tînin. Di warê hişmendiya demokratîk û nûjen de ji gelek neteweyên rojhilata navîn bêtir pêşketî ne, di nava van sî salên dawî de. Dema hûn ji qoziyeke sosyolojîk li van bûyer û kirinan binêrin hûn ê bibînin ku van xebatana bi serê xwe besî avakirina neteweyekê ne.

**Civaknas*



Mem Mîrxan
mmirxan@hotmail.com

## Dûrî min here kurdê pîs!

**"Dibêjin rojekê du kurdan biryar dan ku bibin tirk. Lê nizanin ku wê çawa bibin tirk. Rabûn çûn ba rihspiyekî. Derdê xwe kirin pêşa wî. Wî jî, ji rewşa wan fêm kir û wiha got: "Herin Çiyayê Bavmezinan li serê wî çiyayî spîndarek heye. Hilkişin serê wê darê. Dema we destê xwe bi serê guliya wê ya herî bilid kir hûn ê bibin tirk."**

**Herdû kurdên me radibin, berê xwe didin Çiyayê Bavmezinan. Piştî demekê derdikevin ser quntara wî çiyayî. Bi zor û zehmet, bi qame û hevrazan ve hildikişin û dara ku pîremêr gotiye li wê derê ye.**

**Ji wan yek bi darê ve hildikişe, yê din jî dide pey wî. Dema yê pêşiyê destê xwe dide serê guliyê herî bilind, guh dide xwe mabesta wî hate guhertin.**

**Li jêr dinê re ku hevalê wî jî li pey wî tê. Hema rûyê xwe tirş dike û pehînekê lê dixe û dibêje: Dûrî min here kurdê pîs!"***

Weke vê çîrokê gelek kes ji bo ku bibin tirk dev ji çiyayê Bavmezinan berdin, dikarin derkevin serê Çiyayê Qaf.

Çîrok rastiyê vedibêje.

Li ku derê me behsa biratiyê kir, me pehineke mezin li ser dilê xwe dît.

Tim biratiyek pozbilind ku tu carî hebûna me qebûl nake para me ket.

Lê kurd ne wisa ne.

Hezar sal in ku me ew dan ser serê xwe. Dem hat em birçî man, lê me nanê xwe da wan.

Di dema herî dijwar a şer de jî, me tirk wek neyar nedîtin.

Li tu derê nehat nedîtin ku ji bo tirk jî di nav kurdan de jiyaye û zor û tade dîtiye. Pîrî caran qatilên zarokên me cîranên me yên herî baş bûn.

Deriyê mala me tim ji wan re vekiribû. Ji bo zarokên wan me hem dilê cîranên xwe hem jî serê cîranên xwe yê kurd şikand…

Heta ji bo wan me dev ji kurdîtiya xwe berda. Ji bo ku em bişibin wan me çermê sipî li xwe kir û em bûn kurdên spî. Lê hun dizanin tirkan tu carî em wek bira nedîtin û tevnegeriyan.

Bi êşên xwe re em jî êşandin. (Li ku derê merasîma cenazeyekî tirk çêbû wan lanet li me û heft bavê me anîn).

Eriş birin ser kurdên cîranên xwe.

Ketina hinek bajaran qedexe kirin.

Û kevir û kuçikên nîjadperestiyê bi ser serê me barandin. Weke Mêrsînê, weke Çanakkaleyê, weke Sakarya, weke Eskîşehîre, wek Bursayê…

Û du roj berê jî Îzmîr.

Her roj beşek din li vî filmê bêxêr zêde dibe.

Lê wekî Ahmet Turk jî gotî. "Ger ev êriş berdewam bikin, kes meydanê ji çend çapulcuyan re nahêle." Û ne tenê Îzmîr wê hemû bajar li wan teng bibin.

Ku carek din jî em derketin serê çiya Bavmezinan bila xwedê bela xwe bide me.

**Ev çîroka jor ji pirtûka Mehmet Oncu ya bi navê Çîrokên Kurdan II hatiye girtin.*

## PKK çikbûn û babîzoka kurda ya dîroka nêz e



Serkeft Botan
serkeftbotan@hotmail.com

Mijdar li Kurdistanê di nava şevên payizan de bi xirecir û lihevnekirina demsala payîz û çile yê ye. Di wan salên beriya PKK ê gelê kurd di nabira herdû demsalan de bi ponijandin eş û azaran re derbasdikir û bêçar e û kizirandî bûn. Di mijdara 1978'ê de dengvedanêk ji gewriya pênç hezarsalan olan da ji şevên payizê re û şevan ji hev pirs kir ew çi deng bû ew axîn ew nalîn zîqîniya kîjan bîrînên min bûn. Zîqîniya kîjan hîla min bû. Ew qolincê dîroka telaqmayî bûn. Ew qolinca dîroka gumandî ya penchezarsalî bûn. Şevan ji hev pirsî rojan ji hev pirsî gundiya xeber da karkeran Fîs ka li kuye li kîjan bîrînên newalê min de ye. Ew zayîna pîroz a pîrozbahiyê. Ez zayîna biyolojiyê. Ew zayîna man û nemanê ye. Ew zayiya çand û hunerê. Ew zayîna dergûşa şaristaniyê. Ew zayîna neqşa jiyanê. Ew zayîna şivarêka helbestê. Ew zayîna tekbirina rûreşiyê û bi darvekirina koletiya penchezarsalî ye. Ew zayîna felsefî ya jîndariyê ye.

Ketin riya oxirê. Konê qahrê vegirtin li asoyên bilind li lutkeyên çiyayên lal. Ji qîz û xortên ciwan re banga mirinê li wan kirin; Hao werin em mirinê bi jiyanê tirimpe dikin. Ê ku wêrek in bila bên ê ku fêrisin bila bi lez werin berî sehera sibê berî ku aso agir bi serme de bibarîne werin xwe bikujin ji bona jiyanê belkî xwedayê jînê li me bê rahmê werin her yek ji we bibin xwedayê jînê û Îştara Evînê. Her yek ji we bibin Mem û Zîn û Egîdên evînê mazlûmên birînê. Beriya ku ev aso ev ezman bi ser bêxîrêtiyê de hilweşe werin werin werin xwe bikin mertalê êşên zîndî werin xwe têxin erxên birînên dîrokê bi saxî û ji kêfa dîrok dike bimire.

Mirinên we Rojhilat hejand dengên we dagirker bizdandin kozkên neyaran we bi ser wan de hilweşandin arteş zivêr bûn ji ber we. Peykerê Rindê we li ser piramala badê çikand we artêşa Besê û zarîfê li çiyayên kurdistanê bi efsaneya zîlan afirand. Zarokên kurdan ji tirsa xwe nema tavêjin nava petiyên êgir. Rêbazên xwe bi we guherîn û bun zarokên serhildanan bi dar keviran êrîşî tanq û panzerên dijmina dikin. We civak jibînîde hejand. Ji tirsa we dara koletiyê bê av ma û zer kişiya li herçar hêlên we. Împeretorên koletiyê iskên mirinê hildidin we cîhanek li xwe heyirand we xwewa dagirkeran li wan herimand we sosyal demokratên welatan weke aldofa reyand.

PKK mizgînî û xelata gelê kurdistanê ye. Banga azadiya gelê kurdistanê ye. Mizgîniya ku tu bixawazî tu karî xwe ji vê çarenûsa binalet xelas bikî. PKK banga xîreta gelê kurde. Ku tu bixwazî tu karî xwe bi xîret bikî. PKK ew kesên ku dixwazê tiştekî bike rêvekirina kesa/î ye. PKK ew kesa/î ku ji pergelê aciziya dike û ku nikare li dîjî wê helwestê dayne an ku dixawze tiştekî bêje û ku nabêje dev û zinmanê wî/ê ye.

Zayina PKK zayinek pîroz û bimbareke zayina gelê kurdistanê ye. Zayina 27 mijdarê li gelê Kurdistanê pîroz be.

ROJEV

Zozan Basın Yayın Adına
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Mustafa AGGÜL

**Yönetim Yeri:** Diclekent Bulvarı Termil Apt.
Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
**İdare Tel**: 0 (412) 251 38 88
**Yayın (Weşan)**
**Tel**: 0 (412) 237 48 91 **Fax:** 0 (412) 237 48 89
**Baskı(Çap):**
**Stenbol:** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL
Tel:0 (212) 580 63 81
**Edene:** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA **Yaygın Süreli Yayındır**

www.arsivakurdi.org

# Fermandarê HPG'î jiyana xwe ji dest da



**Hêzên Parastina Gel (HPG) daxuyand ku Fermandarê Eyaleta Mêrdînê Omer Muslum (Rustem) di pevçûna navbera gerîlayên HPG'ê û Artêşa Tirk de jiyana xwe ji dest daye.**

**Şehadeta Fermandarê Eyaleta Mêrdînê Omer Muslum ê di operasyona Artêşa Tirk a li çiyayê Mawayê de jiyana xwe ji dest dabû hate îlankirin. HPG'ê daxuyand ku ji ber ku demeke dirêj têkiliyên wan qut bûye û nekarîne bigihîjin cenaze, şehadeta Muslum derang îlan kirine. Biryargeha Navendî ya HPG'ê der barê şehadeta Muslum de wiha got: "Rêhevalê Rustem di 1969'an de li Kobaniyê ji dayik bûye û li malbateke welatparêz mezin bûye. Rêheval Rustem di 1991'an de tevli refên gerîla dibe. Di jiyana xwe ya şoreşgerî de her tim xwebawer û mutewazî bû ji ber vê yekê jî li her derê bi şexsiyeta xwe daye nîşan da. Peywira partiyê her tim li ser bingeha girêdana pîvanan bi cih aniye. Gelek caran birîndar bûye lê tu caran xwe paşve nekişandiye û bûye pêşeng. Rêheval Rustem piştî perwerdeya 2006-2007'an di bihara 2007'an de çû Botanê. Di encama operasyonên dijmin de meha gulanê li Mawayê şehîd ket. Em ê bibin şopdarê riya wî."** BEHDÎNAN (ANF)

## Ji ber silavê ceza dan girtiyekî

Rêveberiya Girtîgeha Kandirayê bi boneya girtiyê bi navê Huseyîn Kocuk silav daye girtiyekî cezayê giran ê muebetê xwariye bi mehek cezayê mahrûmiyeta mafan ceza kir.

Rêveberiya 2'yemîn Hejmara Girtîgeha Tîpa F a Kandirayê bi boneya girtiyê bi navê Huseyîn Kocuk silav daye girtiyekî cezayê giran ê muebetê xwariye bi mehek cezayê mahrûmiyeta mafan ceza kir. Der barê mijarê de bavê Kocuk, Alaheddîn Kocuk li ÎHD'a Stenbolê daxuyaniyek da çapemeniyê. Kocuk diyar kir ku hefteya borî çûye hevdîtina kurê xwe û zordarî û binpêkirinên li girtîgehan dom dikin. Kocuk anî zimkan ku li gorî agahiyên kurê wî dane bi boneya silav daye hikûmxwarek di heman beşê de dimînin ê cezayê girankirî yê muebetê girtiye, bi mehek mahrûmkirina mafan ceza kir. Kocuk dtiyar kir ku mafên ragihandinê hêj li girtîgehê berdewam dikin û piştî midûrê ji Girtîgeha Wanê hatiye şandin ev pêkanîn zêdetir bûne. Kocak xwes tku hemûkes li hemberî vê yekê bi hîstiyar bin. **STENBOL**

## Serî li ÎHD'ê da

Welatiyê bi navê Îsmet Gursen (30) ê ku rastî gefên leşker û cervanan hatiye serî li Komeleya Mafên Mirovan a (ÎHD) Êlihê da.

Welatiyê bi navê Îsmet Gursan ê 30 salî û bavê 4 zarokan, ku koçer e û her tim li zozanan dijîn, dema ji Wanê diçû gundê Difnê yê navçeya Heskîfê, li ser rê ji aliyê 2 cerdevan, 3 leşker û fermandarê leşkeriyê ve hate rawestandin û rastî gefan hat. Gursen, anî ziman ku 400 pezê wî heye û her tim koçer e. Gursen, da zanîn ku ji Wanê çû Nisêbînê û piştre jî çû Heskîfê û dema diçû gundê Difnê yê Heskîfê ji aliyê cerdevanan ve hate rawestandin û rastî gefên kuştinê hat. Gursen, destnîşan kir ku dema diçû gundê Difnê ji aliyê 2 cerdevan û 3 leşkeran ve hate rawestandin û wiha got: "Cerdevanê bi navê Remezan û leşkeran ez li ser rê rawestandim û 450 TL ji min xwestin. Pere bi minre tunebûn û min got pere tune. Çekên xwe nîşanî min dan û gotin tu pere nede em dê te bikujin. Piştre ez neçar mam ku min çû ji hevalekî pere girt û da wan." Gursen li ser vê yekê serî li ÎHD'a Êlihê da.

Serokê ÎHD'a Êlihê Osman Kunteş, piştî serlêdana Îsmet Gures diyar kir ku Gures di encama binpêkirina mafan de serî li komeleya wan daye ew ê wekî ÎHD dê bûyerê bişopinin. **ÊLIH**

## 3 kes hatin binçavkirin

Li navçeya Pirsûs a Rihayê cendermeyan bi ser gelek malan de girt û 3 kes kirin binçavan. Di serdegirtina malan de, cendermeyan Rêveberê MEYA-DER'ê Kemal Barlîn rêveberê DTP Bekîr Acar û Selma Argun kirin binçavan. Hate zanîn ku 3 kesên hatin binçavkirin birin Qereqola Cendermeyan. **AMED**

## Li Basayê sosretiya dewletê

Li Kurdistanê sosretiya dewletê ya kuştina "Hêstiran" vê carî li navçeya Basayê derket holê. Hate ragihandin ku hêstirên aîdî welatiyên gundê Şehkayê, ji aliyê leşkeran ve di encama serdagirtinên li axur û zeviyan de hatin topkirin û piştre hatin kuştin.

Li Kurdistanê nêzîkatiyên sosret ên dewletê ya li hemberî hestiran gihîştiye astek ecêb. Hestir ku bûne mijara stranan ji bo welatiyên li nêz sînor sewaleke jêneger e. Welatiyên li ser sînor ku ji ber bêkariyê debara xwe bi qeçexvaniyê dikin, hêstiran jî di vî karî de bi kartînin. Lê hêstir, him ji ber di qeçexvaniyê de tên bikaranîn û him jî ji ber fikirînên erzaqê ji endamên PKK'ê re dibe, bûne hedef. Di salên berê de hêstirên li gundan hatin komkirin, hatin kuştin û şewitandin. Di van buyerên sosret de ya herî dawî jî li naçeya Basayê ya Şirnexê pêk hat. Hêstirên aîdî welatiyên gundê Şehkayê, ji aliyê leşkeran ve hatin komkirin û desteserkirin.

Welatiyan diyar kir ku leşkerên aîdî Fermandariya Cendirmeyan a Navçeyê, hêstir ji axur û malan komkirine û wan dikujin. Welatiyan bilêv kirin di salên 1991-1993'yan de rastî bûyerên bi vî rengî hatibûn. **ŞIRNEX**

# Piştî 13 salan gora xwîşka xwe dît

Malbata Odabaşi 13 sal in li gora keça xwe Tellî Odabaşi digeriya. Xwîşka Odabaşiyê, Zuhal Odabaşi gora xwîşka xwe û hevala wê ya bi navê Rojda li gundê Hegaderêyê dît

Cenazeyên gerîlayên PKK'ê yên Tellî Odabaşi (Rojîn) û Rojda ya eslê xwe ji Mêrdînê ye û di operasyona "atmacayê" de ji aliyê leşkerên Tugaya Cendirmeyan a Boluyê ve hatibûn qetilkirin li gundê Hegaderê ya bi ser navçeya Darayeniyê hatin dîtin. Xwîşka Tellî Odabaşi, Zulah Odabaşi ku ev 13 sal in cenazeyê xwîşka xwe digere got ku ew tenê naxwazin cenazeyê xwîşka xwe derxin, heke malbata hevala xwîşka wê bê dîtin dê herdu cenazeyan jî bigirin.

Gora 2 PKK'iyên ku li sêgoşeya Licê, Darayeni û Pasûrê di operasyona "atmacayê" 1996'an de jiyana xwe ji dest dabûn, piştî lêkolîna malbata Odabaşi ya 13 salan hate dîtin. Piştî operasyonê leşkerên Tugaya Cendirmeyan a Boluyê destûr neda bû malbatan ku cenazeyên zarokên xwe bigirin. Lê lêgerîna malbata Tellî Odabaşi ya 13 salan dom kir. Tellî Odabaşi di 1994'an de bi bavê xwe re tevli PKK'ê dibe û di 1996'an de di operasyona "atmaca" de jiyana xwe ji dest dide. Zuhal Odabaşi ku ev 13 sal in li gora xwîşka digere, gora xwîşka xwe li gundê Hegaderê ya bi ser navçeya Darayeniya Çewlikê dît.

**'Dixwest wê bibînim'**

Zuhal Odabaşi roja ku xebera şehadeta xwîşka xwe bîhistiye heta îro li cenazeyê wê geriyayê. Zuhal Odabaşi dibêje ku ew bi salan e xwîşka xwe di xewna xwe de dibîne. Xwîşka wê her tim dixwaze ku gora wê bibîne. Piştî lêgerîna bi salan hîn dibe ku hevalên xwîşka wê ew li herêma Hedagerêyê definkirine.

Li ser vê yekê jî serî li Dozgeriya Komarê ya Darayeniyê dide. Lê dozgerî dixwaze ku ew tam cihê gorê tespît bike. Odabaşi lêkolînên xwe didomîne lê cihê xwîşka xwe nikare tespît bike. Li ser vê yekê Dozgeriya Darayeniyê dosyayê dişîne dadgehê û dadgeh jî biryara neşopandinê dide.

**Li Hegaderêyê dibîne**

Odabaşi li herêma Hegaderêyê ku pir mezin e lêkolînên xwe didomîne. Piştre hîn dibe ku gora xwîşka wê li bin Hegaderêyê cihê ku 2 çemên ku digîhîjin hev in. Dema ku diçe wir di bin zinarê heyî de çaleke dibîne. Vê derê bi destên xwe dikole. Dema ku hinekî dikole çefiyekî dibîne. Bi biryarî wê derê dikole. Hedika çefiyeyê radike û li wir weke ku jê re hatiye gotin hestiyên 2 kesan dibîne. Piştre cardin wê dere digire û ji wir vediqete. Zuhal Odabaşi dibêje ku dayika wê jî çûye gor ditiye. Piştî çend rojan baran dibare û dayika wê jê re dibêje wê di xewna xwe de Tellî dîtiye û jê re gotiye "dayê ji ber ku ez pir şil bûme pişta min diêşe." Piştî ku dayikê wê qala xewna xwe dike ew jî ji dayika xwe de dibêje ku wê li ser gorê baş negirtiye.



Zuhal Odabaşi soza ku daye diya xwe bi cih tîne û axa ku ji derûdorê kom kiriye davêje li ser gora xwîşka xwe. Dema ku ji wer vediqete kevirê gora xwîşka xwe maçî dike. Daxwazake Zuhal Odabaşi jî heye û dibêje ew ê ji bo testa DNA'yê careke din serî li dozgeriyê bidin. Odabaşi di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Bi salan e xweşîka min û hevala wê bi hev re radizên. Ez naxwazim wê ji hevala wê qut bikim. Heke malbata hevala Telliyê neyê dîtin em ê tenê ji bo testa DNA'yê gorê vekirin. Lê ji ber ku em naxwazin wan ji hev qut bikin em ê hestiyên xwîşka min jî li vir bihêlin. Qasî ku em dizanin qodnavê hevala xwîşka min Rojda ye û ji Mêrdînê ye." **AMED (DÎHA)**

# 'Meclisa Xizmên Winda û Şehîdan' hate avakirin

Komeleya Hevgirî û Piştgiriyê ya Malbatên Xizmên Windayan (YAKAY-DER) di çarçoveya xebatên xwe de Meclisa Xizmên Winda û Şehîdan ku ji dadmend, nûnerên saziyên civakî û gelek rewşenbîran pêk tê ava kir.

Li ser biryara di 4'emîn kongreya melek berî niha pêk de hatî girtin de ligel malbat û xizmên kesên di bin çavan de hatine windakirin û bi awayek kiryar nediyar hatine qetilkirin, nûnerên saziyên civakî, dadmend û rewşenbîr jî di nav de bi tevahî ji 80 kes cih digirin. Serokê Giştî yê YAKAY-DER'ê Cemal Bektaş ku derbarê xebatan de agahî da, balkişand ser girîngiya avakirina meclisê. Bektaş ev tişt gotin: "Me malbat anîn cem hev û bi wan re biryara avakirina Meclisê da. Armanca me ya bingehîn ew e ku xebatên têkildarî kuştinên kiryar nediyan û windakirinên di bin çavan de yên bi doza Ergenekonê cardin hatine rojê pêş bixin. Her wiha li ser vê bingehê mijara komên tomarî û qetilkirinên pêk hatîn jî em derdix holê. Ji bo ev rastî derkevin holê me dê xebatên xwe berfireh bikin."

Li ser mijarê Bektaş anî ziman ku di pêşerojê de dê bi beşdariya gelek zanyar, akademîsiyen û rewşenbîran dê xebatên berfireh, çalakî û konferansa bimeşînin û ev tişt gotin: "Her wiha em dê hewil bidin ku xwe bigihînin xizmên kesên bi awayek kiryar nediya hatine qetil kirin û li ser mijarê agahiyan berhev bikin. Li herêmên Ege û Marmarayê gelek bûyerên wiha hene lê heta niha ji ber kêmasiyan malbat negihiştine hev û xebatek bi rêxistin nehatiye meşandin. Em dê vê xebatê jî bimeşînin." Bektaş debirî ku dixwazin xebatên xwe zêde bikin û mijarê heta qada navneteweyî bibin. **STENBOL**



Cemal Bektaş

## Polîsan bi ser malan de girt

Li Colemêrgê polîsan bi ser gelek malan de girt û di encama serdegirtina malan de 5 kes binçav kirin.

Li gelek taxên Colemêrgê bi armanca şermizarkirina êrîşa li dijî konvoya DTP'ê ya Îzmîrê çalakî hatin lidarxistin. Piştî çalakiyan polîsan hemwext bi ser gelek malan de gîrtin. Polîsan di encama serdagirtina malan de 5 kes binçavkirin. 5 kesên hatine binçavkirin birin Midurîyeta Polîsan a Colemêrgê. **COLEMÊRG**

# 'Şîdeta li hemberî jinê bêceza dimîne'

## Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna ku di civîna koma partiyê de der barê 25'ê Mijdarê Roja Piştevaniya Jinê û Têkoşîna li Hemberî Şîdeta li Dijî Jinê ya Navneteweyî de axivî, diyar kir ku şîdeta li hemberî jinê li Tirkiyeyê di asta herî jor de ye

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna, di civîna koma partiyê de, bi boneya 25'ê Mijdarê Roja Piştevaniya Jinê û Têkoşîna li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinê ya Navneteweyî, li ser mijara jinê axivî. EMEP, Partiya Sosyalîst, SDP, KESK, Egîtîm Sen, Antî Kapîtalîst, Halkevlerî, Femînîstîz, Komeleya Jinên Kedkar û nûnerên Komeleya Teşebûsa Jinên Rojhilata Navîn, wekî mêvan beşdarî civîna çapameniyê ya Koma DTP'ê ya Meclîsê bûn.

Ayna, derbarê Roja Mamosteyan de jî diyar kir ku dixwazin tengasiyên mamoste di warê siyasî, civakî û çandî de dijîn, girêdana wan bi asta travmayên civakê ve çêkin û wiha got: "Mamosteyên me, ji bo pirsgirêkên dijîn û daxwazên xwe bi awayekî tevgerkirî bînin ziman, tevgerên ku ji bo dengê xwe bigihîjin saz dikin, rastî pêkutiyan tên. Ji ber hişmendiya yektiyê ji zarokên 6 saliyan destpêdike û li Tirkiyeyê serdest dike. Me bi tengasiyên ku niha têne jiyandin re rû bi rû dihêlin." Ayna, 24'ê Mijdarê Roja Mamosteyan pîroz kir. Ayna, anî ziman ku ew dê piştgiriyê bidin çalakiya KESK'ê

**Dewlet şîdetê nepenî dike**

Ayna, diyar kir ku şîdeta li hemberî jinê di hemû pergalan de tê bikar anîn û wiha got: "Şîdeta li hemberî jinê binpêkirina mafên mirovan ya herî gelek tê bikar anîn e. Niha dema ku em li vir vê mijarê niqaş dikin, li cihekî din yê cihanê şîdeta bi destê dewletê û sedem wê dewlet li hemberî jinê tê kirin. Bilî vê şîdetê, şîdeta hevseran, bavan û birayan jî didome. Belkî niha jinek binavê namusê tê kuştin, bi zorî tê zewicandin, tê recm kirin û an jî di herêmên şer de bi bombeyan tê kuştin. Belkî niha bi hezaran jin tên tecawiz kirin, îşkence kirin an jî di binçavan de tê windakirin. Mixabin şîdeta li hemberî jinê ya dinava malê de bi awayekî asayî tê dîtin. Ev şîdet bi destê dewletê tê kirin û careke din bi destê dewletê tê veşartin."

Li ser mijarê Ayan, diroka 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Jinê ya Navneteweyî ya li Heberî Şîdeta Zayendî vegot û di vê mijarê de hêmanên "Hêz, Desthiladarî û Serdestî" hene wiha domand: "Pergala zilam şîdet li ser jinê daye dest pêkirin û bi vi awayî civak ji kiriye kole. Ji ber vê yekê şîdet demara desthiladariyê, serdestiyê û zordariyê ye. Hêmana desthiltdariyê di aliyê mezinahiyê de 'dewlet' aliyê taybet de jî asata pûcûk de kesekî li ser kesekî din desthiladariya xwe bikeye." Ayna, destnişan kir ku jin di serî de desthiladariya dewletê û serdestiyên din hemû lêpisin û red kirine. Ayna, bilêv kir ku li hemberî pergala serdestiya zilam têkoşînekî yekpare dane û heya jin azad nebe civak azad nabe. Ayna, da zanin ku şîdeta li hemberî jinê pirsgirêkekî gerduniye û wiha berdewamî axiftina xwe kir: "Li gorî Rêxistina Tendûristiyê ya Cihanê, her ji 3 jinan yek, nêzî milyarekê jin ji ber zayenda xwe rastî şîdetê tên. Vê yekê jî bi piranî yan yêk jî malbatê, yan jî naseke jinê ye. Sedan 70 jinên hatine kuştin qatilê wan partnerên wan in."



**'Şîdeta aboriyê sereke ye'**

Ayna, destnişan kir ku şîdeta li dinyayê ya herî zêde li hemberî jinê tê bikar anîn ya aboriyê ye. Ayna, destnişan kir ku nufusa cihanê nivek ji jinan pêk tê, saetan xebatên civakê sedan 66 bi keda jinê pêk tê lê ev yek incax sedan 10 di aliyê xweditiyê de jî sedan yek aîdî jinê ye. Ayan wiha axivî: "Li Tirkiyeyê jî rewş gelek ji ya cihanê cuda nîn e. Şîdeta li hemberî jinê pêk tê hemû cureyên wê li Tirkiyeyê jî pêk tên. Dewlet piştî salên 80 dest bi helwestkî dijî şîdeta jin bû. Miduriyeta Giştî ya Statuya Jinê di sala 2009'an de derxistin. Li Tirkiyeyê tişta herî giring lêkolîna şîdeta dinav malê de bê kirin bû. Li Tirkiyeyê dinava malê de şîdetekî mezin li hemberê jinê tê bikar anîn. Li gorî lêkolînê jinên zewicî sedan 39 rastî şîdeta fizîkî tên, sedan 15 rastî şîdeda zayendî tên, ji sedan 42 rastî şîdeta fizîki tên, ji sedan 44 jî rastî şîdeta hesiyarî tên. Li gorî hejmarên fermî yên dewletê li Tirkiyeyê her ji 2 jinan yek di nava malê de rastî şîdetê tê."

Di axaftina xwe de Ayna, destnîşan kir ku li tevahiyê Tirkiyeyê ji sedî 42 rastî êrîşê hatine û wiha got: "Ev rêje li aliyê çoltarê ji sedî 47, li bajaran jî ji sedî 43 ye. Li gorî vê rastiyê piraniya jinê li hemberî şîdeteê bê deng dimînin. Ji sedî 49'ê jinan li hemberî êrîşa bêdeng dimînin. Ji sedî 92'yê jinan piştî rastî êrîşê tên serî li tu deran nadin û alîkariyê naxwazin."

**Zimanê medyayê...**

Ayna, da zanîn ku li ser navê tore û namûsê gelek jin têne kuştin. Ayna, bibîrxist ku li Tirkiyeyê rojê nêzî 4 jinan têne qetilkirin û wiha dom kir: "Medya hîn kuştininên jinê wekî 'namûs, hesudî, tore' bi nav dike. Ev êrîşa li ser jinê ji aliyê DMME'ê ve jî tê xuyakirin. Rapora tacîz û tecawuza binçavan rewşek pir eceb li ber çavan radixe. Di heman raporê de tenê li Stenbolê di 12 salan de 304 serlên li Buroya Hiqûqê hatine kirin. Ayna, bibîrxist ku derbarê tecawuz û tacizên binçavkirinê de 227 polîs, 85 leşker û 14 tîmên taybet tev li van bûyeran bûne, lê heta niha tenê 3 cerdevan hatine darizandin. Ayna, destnîşan kir ku jina 14 salî di bin çavan de rastî tacizê hat û piştre malbatê ew negirt hundir û piştre jî wê zaroka 14 salî întîxar kir. Ayna, axaftina xwe wiha dom kir: "126 jinan ji ber ku gilî kir rastî neheqiyên giran hatin. 37 jinan Tirkiye terk kirin û derketin dervê Tirkiyeyê. Li gorî raporê jinên ku serî lê dane 233'yên wan kurd, 63 Tirk in. Bi piraniya jinan piştî salên 1990'î de di bin çavan de rastî tacîz û tecawizê hatin. Di 21'ê hezîrana 2009'an de li Amedê endama DOKH'ê rastî îşkenceya fîzîkî û zayendî ya polîsan hat. Lê belê hîn derbarê wan polîsan de tiştek nehatiye kirin. Jinên ku gilî dikin jî li gilîkirina wan poşmand dikin.

Derheqê mijarê de Ayna, da zanîn ku êrîş û tundiya li dijî jinê de bi yekîtî û hevgiriya jinê her wiha bi têkoşîna jinê bi dawî bibe. Ayna, bibîrxist ku di 30 salên dawî de jinan gavên erênî avêtine û bingehekî têkoşînê hatiye avakirin. Ayna, destnîşan kir ku wan li dijî şideta li hemberî jinê têkoşînek mezin meşandine û dengê xwe li her derê belav kirine. Ayna, anî ziman ku Meclîsa Jinê û Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) di çarçoveya 25'ê Mijdarê de bi slogana "Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" li Dêrikê, Êlihê Riha, Îzmîr û Wanê kon vekirine û li dijî şîdeta li hemberî jinê nobet girtine û bi dehan semîner û panel pêk anîne. Ayna, anî ziman ku dê têkoşîna wan a li dijî feraseta mêr bidome û wiha got: "Ev têkoşîn ne tenê j bo jinê ye. Her wiha ji bo azadiya mêr jî girîng e. Têkoşîna me ji bo cîhanek azad û wehkev e. **ENQERE (DÎHA)**

# Li Bêgirî û Çildêranê coşa gel

Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên li ser banga Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, ji Qendîl û Mexmûrê hatî li navçeyên Bêgirî û Çildêranê yên Wanê ji aliyê hezaran kesî ve hatin pêşwazîkirin. Di dema pêşwazîkirinê de endamên komê bang li cerdevanan kirin û xwestin çekên xwe danên û alîkariyê bidin pêvajoya aştiyê. Endamên Komê li Amedê jî çûn serdana Baroyê.

Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê li navçeyên Bêgirî û Çildêranê yên Wanê ji aliyê hezaran kesî ve hatin pêşwazîkirin. Endamên Koma Aştiyê ya Qendîlê Gulbahar Çîçekçî, Hamiyet Dînçer û ji endamên Koma Aştiyê ya Mexmûrê Nurettin Turgut û Nizar Buldan, bi rêveberên DTP'ê re li Navçeya Bêgiriyê bi coşeke mezin hatin pêşwazîkirin.

**Banga ji bo cerdevanan**

Endamê Koma Aştiyê ya Qendîlê Hamiyet Dînçer, diyar kir ku ji Xabûrî û heta niha kesê ku dîtine tenê daxwaza wana aştî bûye û wiha got: "Bi salan ji bo kurdan li hev sor bikin ketin nava gelek hewldanan. Bi pergala cerdevaniyê bi salan, bira bi bira dan kuştin." Dînçer, bang li cerdevanan kir û wiha axivî: "Ez li vir bang li cerdevanan dikim; Werin çekên xwe deynin û deng bidin dengê gelê kurd ê aştiyê." Dînçer, got ku muxatabên pêvajoya aştiyê diyar in û ev tişt gotin: "Muxatap birêz Ocalan û Qendîl e."

**'Makeqanûna Mexmûrê'**

Endamê Koma Aştiyê ya Mexmûrê Nizar Buldan: "Gelê kurd, bi salan ji aliyê dewletê ve li hemberî hev hate bikaranîn. Ji bo em vê yekê bidawî bikin, divê em lîstika cerdevaniyê bi dawî bikin. Li vê herê bi salên dirêj, ji ser cerdevanan şerê qrêz hate meşandin."

**Li Çildêranê coşa mezin**

Endamên Koma Aştiyê li Çildêranê ji aliyê hezaran kesî bi dirûşmeyên "Bijî Serok Apo", "PKK gel e gel li vir e", "Kurdistan bi wê serbilind e" li ber avahiya DTP'a navçeyê hatin pêşwazîkirin. Girseyê pankartên "Em qasidên aştiyê bi Rihê Apocî slav dikin", "Em ê textê haramiyan hilweşînin" vekirin. Endamê Koma Aştiyê Gulbahar Çîçekçî, der barê pêvajoya aştiyê de wiha axivî: "PKK'ê ji 13'ê nîsanê û vir de agirbeta yek alî îlankiriye jî dewlet bi operasyon ev gav bersivandiye."

Çîçekçî, daxuyand ku "Ne hatine teslîm bibin û ne jî kesî teslîm bigirin" û wiha got: "Em li ser banga Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan hatin." Nurettin Turgut jî, nîqaşên der barê gelê Mexmurê di wiha bersivan: " Gelê Mexmûrê yê Birêz Abdullah Ocalan û PKK'ê n. Ger çareseriyek hebe dê di vê çarçoveyê debe. Bila cendevan jî çekên xwe dînin û dev jî herikandina xwîna birayên xwe berdin." Endamên Komên Aştiyê ku pişt re vegeriyan Wanê, çûn serdan Akademiya Siyasetê ya DTP'ê Platforma Şaxên KESK'ê ya Wanê."



**Çûn serdana Baroyê**

Emdamên Komên Aştiyê li Amedê jî çûn serdana Baroyê. Serokê Baroya Amedê Mehmet Emîn Aktar di dema serdanê de got ku hewldanên ji bo aştiyê ji şer zortirin û got ku ewl hemû hewldanên ji bo aştiyê pîroz dibînni. **WAN / AMED**



# 'Nêzîkatiya ji bo Ocalan provekirina pêvajoyê ye'

Li Amedê saziyên sivîl ên civakî, bi boneya daxwaza nexşeriya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û başkirina şert û mercên Ocalan, her wiha desteserkirina pirtûkên parasnameyên DMME'ê şermezar bikin daxuyanî dan û diyar kirin ku nêzîkatiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan sedema provakasyona pêvajoyê ye.

Endam û rêveberên TUHAD-FED, TUHA-DER, MEYADER, Însiyatîfa Dayikên Aştiyê, KURDÎ-DER, Goç-Der û Navenda Çandê ya Dîcle Firatê, li avahiya TUHAD-FED'ê civina çapemeniyê pêk anîn. Di civînê de Serokê Giştî yê TUHAD-FED'ê Mahmut Dogu axivî û diyar kir ku hewldanên AKP'ê li dijî çareseriyê ye û wiha got: "Hewildanên çareseriyê hewldanên xapandinê ne. Bi nêzîkatiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan tê xwestin ku pêvajoyê proveke bikin. Li şûna şert û mercên Brêz Ocalan baş bikin, hîn zêdetir xirabtir kirin. Bi van kirinan jiyana Brêz Ocalan tehdît dikin."

Dogru, bertek nîşani desteserkirina parêznameyên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku ji bo DMME'yê nivîsandibûn jî da û wiha dom kir: "Hem tecrîda li ser birêz Ocalan giran dikin, hem jî sansurê datînin ser. Naxwazin xwe îfade bike û biparêze. Mafê azadiya parastinê binpêdikin. Nêzîkatiya AKP'ê ya li dijî Ocalan ji aştiyê re xizmetê nake. Divê şert û mercên birêz Ocalan bê başkirin û nexşeriya Ocalan ji rayagiştî re bê aşkekerkirin. Her wiha divê dîsa parasnameyan bidin weşanxaneyê." **AMED (DÎHA)**

www.arsivakurd.org

# ‘Dest ji neyartiyê berdin’

## Serokwezîr Erdogan dîsa DTP wekî hedef nîşan da û li êrîşên nijadperest ên li hemberî DTP’ê xwedî derket. Berdevka Çapemeniyê ya DTP’ê Tuglukê got ‘dest ji neyariya kurdan berdin’

Serokwezîrê Dewleta Tirk Recep Tayyîp Erdogan careke din DTP hedef nîşan da û êrîşên nijadperestan ên li hemberî konvoya DTP’ê rewa dîtin. Parlamentera DTP’ê ya Amedê Aysel Tugluk got, ‘heke kurd jî kesê negirin Amedê wê demê dê çi bibe? Divê dest ji neyartiya kurdan bê berdan’. Parlamenterê DTP’ê yê Şirnexê Hasîp Kaplan jî got ku tu hêz dê nikaribin ala me qedexe bikin

Serokwezîrê Dewleta Tirk Recep Tayyîp Erdogan beriya ku biçe Lîbyayê li balafirgehê daxuyaniyek da çapemeniyê û êrîşên li hemberî DTP’ê pêk hatîn rewa dîtin. Erdogan ê ku êrîşa li Stenbolê bi çifteyê li hemberî xwepêşandêrên kurd pêk hatî rewa dîtibû û wekî ‘helwesta welatîbûnê’ nav kiribû; vê carê jî êrîşa li Îzmîrê li hemberî konvoya DTP’ê pêk hatî rewa dît.

**Dîsa hedef nîşan da**

Erdogan wiha got: “Alên rêxistineke derqanûnî û posterên serkêşê cudaparêziyê hildigirin. Divê destûr ji vê yekê re neyê dayîn. Em destûrê nadin. Li kîderê tiştekî wisa çêbibe, divê demildest mudaxele bê kirin û em ê mudaxele bikin.”

Erdogan li dewsa êrîşên li hemberî xebatên partiyeke siyasî pêk hatîn rexne bike, bi vê daxuyaniya xwe piştgirî da wan êrîşan.

**Bangî CHP û MHP’ê kir**

Parlamentera DTP’ê ya Amedê û Berdevka Çapemeniyê Aysel Tugluk jî bi mebesta êrîşan û gotinên Erdogan ên van êrîşan rewa dikin anî ziman ku êrîş hatine plankirin. Tugluk wiha got: “Alîgirên MHP û CHP’ê li hemberî me hatine zêrandin û daxistine kolanê. Em ji wan dixwazin ku alîgirên xwe kontrol bikin. Bila tu kes kurdan bêxwedî nebîne. Kurd, gelekî bê rêxistin nîn e. Ev liv û tevger dê gelê kurd tehrîk bikin. Dibe ku nerazîbûna xwe ya demokratîk bi şêwayekî nîşan bidin. Heke sibê kurd jî nehêlin tu kes bikeve Amedê, dê çi bibe? Divê her kes dest ji neyartiya kurdan berdin.”

**‘Ala nayê qedexekirin’**

Parlamenterê DTP’ê yê Şirnexê Hasîp Kaplan jî bertek nîşanî gotinên Erdogan da û wiha got: “Ne Serokwezîr û ne jî tu kesê din nikare ala me ya ku rengên wekê kesk û sor û zer in qedexe bikin.” Kaplan got, ‘qey Serokwezîr aqlê xwe xwariye’. **AMED**







## Erdogan mînaka muxatabgirtina Mandela da

Hevserokê DTP’ê Ahmet Turk, diyar kir ku Serokê PKK’ê Abdullah Oclan muxatab neyê girtin pirsgirêka kurd nayê çareserkirin û destnîşan kir ku li Afrîkaya Başûr Nelson Mandêla muxatab nehatibûya girtin, pirsgirêk çareser nedibû.

Turk, li ser lîstik dek û dolabên desthilatdariya AKP’ê jî rawestiya û bal kişande ser gotinên Erdogan û got: Birêz Erdogan, ne dilsozê çareseriyê ye, kuştinê derdixe pêşiya gelê kurd. Asîmîlasyon rengekî kuştinê ye. Erdogan asîmîlasyonê li ser gelê kurd ferz dike. Gelê kurd vê qebûl nake. Turk, siyaseta nijadperestî ya CHP û MHP’ê jî bi zimanekî tund rexne kir û got: “Bila baş bê zanîn ku, gelê me dikare xwe biparêze.” Turk helwesta AKP’ê ya ji bo Îmraliyê jî wekî provokasyon nav kir. **AYDIN**

## Li Çelê bertek, li Bismilê îstîfa

Serokê DTP'a Çelê Fariz Çetînkaya, bertek nîşanî axaftina Cîgirê Serokê Giştî yê CHP'ê Onur Oymen da û bang kurdên ku endamên CHP'ê ne, kir û xwest îstîfa bikin. Rêveberê CHP'a Bismilê Îbrahîm Ekîncî bertek nîşanî gotinên Cîgirê Serokê Girştî yê CHP'ê Onur Oymen da û jî CHP'ê îstifa kir.

Serokê DTP'a Çelêya Colemêrgê Fariz Çetînkaya, têkildarî axaftina Cîgirê Serokê Giştî yê CHP'ê Onur Oymen ên der barê "Komkujiya Dêrsimê" de kiribû li avahiya navçeyê civîna çapemeniyê pêk anî. Çetînkaya, diyar kir ku axatfina Onur Oymen tenê gotina wî nîn e û ev helwesta CHP'ê ye. Çetînkaya, anî ziman ku dê gelê herêmê bersivekî baş nîşanî siyaseta CHP'ê ya nijadperest bidin û bang li hemû kurdên ku endamên CHP'ê ye kir û xwest îstîfa bikin.

**Rêveberê CHP’ê îstîfa kir**

Rêveberê CHP'a Bismilê ya Amedê Îbrahîm Ekîncî, bertek nîşanî gotinên Cîgirê Serokê Giştî yê CHP'ê Onur Oymen da û ji bo Oymen protesto bike ji CHP'ê îstifa kir. Hate zanîn Ekîncî Serokê Rêxistina DTP'ê yê Navçeya Bismîlê Mehdî Tanrikulu ziyaret kir û wiha got: "Ji ber gotinên Onur Oymen yên faşîzan û êrîşa li dijî DTP'ê ya li Îzmîrê pek hatî portestê bikim min îstîfa kiriye. Ez li vir bang hemû kurdên di nav partiyên din de cih digirin dikim ku îstifa bikin." **COLEMÊRG / AMED**

## Tabelayên bi kurdî çikilandin

Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê biryara Meclisa Giştî ya Bajar a têkildarî bikaranîna navên kurdî bi cih tîne. Atolyeya Trafîkê ya Bajarê Mezin tabelayên hatine amadekirin ên nû li daketina gundan bi cih dike. Navên gundan bi orjînala wan û tîpên kurdî hatin nivîsandin. Gundiyên navên gundên xwe bi kurdî dîtin jî ji pêkanînê gelek keyfxweş bûn.

Meclisa Giştî ya Bajar a Amedê demek berî niha biryar girtibû ku navên gundan li gorî orjînaliya wan a kurdî û ermenî bên nivîsandin. Li gorî biryarê ligel navên piştre bi tirkî li gundan hatine kirin dê navên kurdî û ermenî jî di nav kivanekê de li ser tabelayan bên nivîsandin.

Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê dest bicihanîna biryara Meclisa Giştî ya Bajar kir. Tabelayên gundên di nav sînorên Bajarê Mezin de cih digirin yek bi yek tên nûkirin. Bi pêkanînên ligel navên dewletê li gundan kirîn û di nav gel de nayên bikaranîn, dê navên orjîna ên kurdî û ermenî jî cih bigirin. Di tabeleyan de nav li gorî alfabeya kurdî bi tîpên X, Q, W, Ê, Î jî tên bikar anîn. Tabela li Atolyeya Makîneyan a Şaredariya Bajarê Mezin tên amadekirin.

**Gundî bextewar in**

Li ser tabeleya gundê bi navê 'Yeşîldal' hatiye fermîkirin, navê gund ê rast 'Hewarê Xasî' jî hate nivîsandin. Niştecihên Gundê Hewarê Saxî ev pêkanîn bi bextewariyek mezin pêşwazî kirin. Ji niştecihan Mehmet Karadaş anî ziman ku her tim navê kurdî bikar anîne û wiha got: "Li Amedê hûn bêjin Yeşîldal kes nizane. Bes dema we got Hewarê Xasî herkes gundê me dizane." Şehmuz Karadaş jî anî ziman ku navê gundê wan piştî Darbeya 12'ê Îlonê hatiye guherandin û wiha axivî: "Ev 30 sale navê gundê me guherandibûn lê kesê bi kar nedianî. Herkes cardin navê Hewarê Xasî bikar tîne." Veysel Karadaş jî diyar kir ku êdî qedexe ji hêla kurdan ve nayên qebûlkirin û xwest ku perwerdehiya kurdî li gund bê dayîn.

**Biryar çûbû dadgehê**

Meclisa Bajar a Giştî ya Amedê di sala 2007'an de biryara nivîsandina navên kurdî û ermenkî jî dabû. Bes biryar ji bo bikeve pratîkê ji Walîtiya Amedê re hatibû şandin. Walîtiya Amedê biryara red kiribû û bi hinceta tenê mafê guherandina navên gundan a Wezareta Karên Hundir heye biryar ji wezaretê re hatibû şandin. Li ser vê yekê Meclisa Bajar biryar biribû dadgehê. Dadgehê jî biryara walîtiyê di cih de dîtibû. **AMED (DÎHA)**






Adil Zozanî
a_zozani@hotmail.com

## Rewşa me zilaman...

Îro 25’ê mijdarê ye. ‘Roja Têkoşîna li Hemberî Şîdeta li Dijî Jinê’... Zilamên ku li pey parastina ‘îktîdara’ xwe digerin, dibe ku bêjin; ‘ev ji me kêm bû’... Divê em îtirafeke ‘samîmî’ bikin. Gelek ji dibêjin, ‘weleh-bileh li mala min hikmê jinê serdest e’. Di sonda me de jî tundî parêzî heye. Em dibêjin ‘li malê’... nabêjin ‘di jiyana me ya hevpar de’...

Ji xwe heke em bêjin ‘di jiyana hevpar de’ serdestiya jinê heye... em jî dizanin ku gotina me dereweke mezin e. Lewre ne wisa ye.

Niha, her zilamek rûne û îtirafnameya xwe binivîse, rastiya jinê jî dê derbikeve holê.

Bawerim gelek jinên têkoşerên azadiyê hevoka min a dawiyê jî na ecibînin. Lewre di vê hevokê de jî têhna îktîdarbûna zilaman heye. Rast e. Lê em qalmecal in ku wisa nêz bibin. Lewre aliyê ku têgeha ‘wijdanê’ ji bîr kiriye zilam in. Ne jinin.

Ez ê îro mînakeke ku sînorên wijdanê jî bezandine bidim. Di hişmendiya me zilaman de jin êdî wekî sembola ‘bênamûsiyê’ cih girtiye. Di serê her heqaret û bêrûmetiya me de têgaheke ‘mê’ heye. Heta di nava demê de jin jî bi giştî hînî vê yekê bûne.

Ji ber hindê kampanyaya Tevgera Jinên Demokratîk û Azad a ku ev salek bû dom dikir ji bo min watedar bû. Dirûşam kampanyayê ‘Em jin in, ne namûsa çu kesê ne, namûsa me azadiya me ye” bû. Vê dirûşmê di hindurê me di jêrhişa me zilaman de çiqas cihê xwe girt? Gumana min heye. Ez jî tevî, peywa ‘namûs’ ji bo me zor hat. Heke me yekoyeko negotibe jî me di dilê xwe de gotiye ‘ev dirûşm ji kû derket?’ Lewre, têgaha ‘namûsê’ ji holê bê rakirin, ‘îktîdara’ me ya li ser jinê têk diçe. Ji ber hindê dirûşma kampanyayê li me ‘zor’/stûr hat.

Vêca mînaka ku sînorên wijdanê jî bezandine parve bikim. Mînakeke ku bi qasî vê mafdariya kampanyaya Tevgera Jinên Demokratîk û Azad vebêje nabe.

Gerînendeyê Giştî yê Diyarbakir Soz Omer Buyuktimurê di 27’ê cotmehê de ji demê Midûrê DEDAŞ’a Amedê Nîhat Nurbakî –ku çend meh berê ji aliyê hikûmeta AKP’ê wekî midûr hatiye tayînkirin- van hevokan radigihîne: **“Fatoreyên ceryanê yên jinên ku hevserên wan li leşkeriyê ne, jinên bi tenê dijîn û pereyê wan neyî li hemberî têkiliya ‘zayendî’ tên sifirkirin.”** Nurbakî van gotinan ji nameyeke ‘îxbarê’ radigihîne. Ligel ku mehek di ser re derbas bûye midûr Nurbakî hê jî gotinên xwe paşve negirtine.

Parlamenterê DTP’ê yê Amedê Selahattîn Demîrtaş di 19’ê mijdarê de ev gotin anîn rojeva hemû parlamenterên Amedê û ji wan xwest ku vê heqareta ku di serî de li jinan û hemû Amedê hatiye kirin qebûl nekin.

Her wiha Komeke Jinên Amedî jî malpera bi navê www.imza.info.tr vekir û li hemberî gotinên midûrî kampanya da destpêkirin.

Jinên ku kampanya daye destpêkirin, tînin ziman ku gotinên Nurbakî mohra ‘fahîşetiyê’ li hemû jinên Amedê daye.

Belê gotinên Nurbakî ji bo jinan tê vê wateyê. Lê ji bo zilaman tê çi wateyê? Em çi difikirin?

Gelo, em çiqas ji hişmendiya Nurbakî dûr in?

Heke helwesta ku me nîşandayî wekî pîvan bê qebûlkirin; rewşa me kambax e.

Gelo Nurbakî dê li cihê xwe rûniştî be?

9 jê zilam 11 parlamenterên Amedê hene. Ev kesê ku bi îradeya siyasî li ser vê kursiyê hatiye rûniştandin ji wir neyê rakirin, gotineke ku em bêjin nîn e.

Em zilam, divê îro careke din bifikirin. Rewşa me çiqas kampaxe bibînin.

www.arsivakurdi.org

## Tehdîda darvekirinê zêde dibe

Nerazîbûnên girseyî yên li dijî cezayê darvekirinê li Îranê ji bo hin girtiyên endamê PKK û PJA'ê encaman bide jî her diçe hejmara girtiyên ku cezayê darvekirinê lê tê birîn zêde dibe. Hat gotin ku li Îranê 3 kurdên din yên bi navê Seyd Samî Huseynî, Seyd Cemal Muhemedî û Mistefa Selîmî Eyluyî bi hinceta piştgiriya PJAK'ê dikin cezayê darvekirinê li wan hat birîn û ew şandin girtîgeha Urmiyeyê. Ligel van her sê kurdan li Îranê hejmara kurdên ku niha li ber cezayê darvekirinê tên rawestandin bû 13. TEHRAN

# Di roja 27'an de piştgiriya mezin

Greva birçîbûnê ya girtiyên ji doza PKK'ê û PYD'ê yên li girtîgeha girtîgeha Edra Şamê kete roja 27'an.

Tevî ku berxwedana girtiyên ji doza PKK'ê û PYD'ê kete roja 27'an jî dewleta Sûriyeyê xwe li daxwazên kurdan ker dike.

Bi ser de jî betirpêr KCK Rojavayê ragihand ku Dadgeha Dewletê ya Şamê cezayên 5 girtiyên PYD'ê ji ber ku tevlî greva birçîbûnê bûne zêdetir kiriye.

**Ji Oldenburgê piştgirî**

Li aliyê din çalakiyên piştgiriyê jî dewam dikin. Li bajarê Oldenburga Almanyayê jî bi şiara 'em bi we re ne' pêr greva birçîbûnê hat lidarxistin. Rewşenbîrên kurd bi çalakiyê de gotin 'Girtiyên azadiyê yên li girtîgeha Edrayê, em bi we re ne." Der barê mijarê de komîteyên amadekar ên çalakiyan banga hestiyariyê li kurdistaniyan kir û xwest ku dengê xwe li dijî zextên dewleta Sûriyeyê bilindtir bikin. OLDENBURG




Li bajarê Oldenburga Almanyayê roja 26'an rewşenbîrên kurd dest bi greva birçîbûnê ya piştgiriyê kir.

## Ewropayê Tirkiye rexne kir û jê re wiha got:

# Pirsgirêka kurd çareser bike



**Tirkiye di rojên dawî de ji gelek aliyan ve rastî rexneyan tê û herî dawî YE'yê di rapora firekirinê de ji Tirkiyeyê xwesk ji bo pirsgirêka kurd hewldanên şênber pêk bîne**

Di rapora Firehkirina Yekîtiya Ewropayê de, ji Tirkiyeyê tê xwestin ku di pirsgirêka kurd de, gavên erênî û berbiçav biavêje.

Rapora Firehkirina Yekîtiya Ewropayê ji aliyê parlamentera Yekîtiya Ewropayê Gabriele Albertinî ve hate amadekirin û pêr, di Komisyona Karên Derve de, hate nîqaşkirin.

Rapor, ji bilî çareseriya pirsgirêka kurd, ji Tirkiyeyê dixwaze ku astengiyên li pêşiya elewiyan jî ji holê rake.

Rapor, der barê têkiliyên Tirkiyeyê yên bi Îranê re jî di bin çavan re derbas bike û daxwaz dike ku di siyaseta derve de bêhtir bi koordinasyona Yekîtiya Ewropayê re di nava havkariyê de be.

Her wiha dîplomat û siyasetmedarên ewropî ji destnîşan kirin ku Tirkiye, ji Ewropayê dûr dikeve û desthilatdariya Erdogan rexne kirin.

**Xetera piştgiriya dîplomatîk**

Pêr jî Rojnameya Washington Post a Amerîkayê di sernivîsa xwe de polîtîkayên Erdogan û AKP'ê rexne kiribûn û wiha digot: "Erdogon polîtîka 'kirêt' ya derve dimeşîne, bi hewldan û bi têkiliyên xwe prestîja dîktatorên welatên misilman berz dike; her diçe dev ji xîmên demokratîk berdide. Ev jî hin pirsên gelo Erdogan piştgiriya dîplomatîk ya Israîl, Amerîka û YE'yê winda dike? Di seriyan de diafirîne. Heke rewşeke wisa derkeve hole pêkan e ku Erdogan û AKP bi tengasiyên mezin re rû bi rû bimînin.

Balkêşe ku ev daxuyanî beriya ku Erdogan biçe serdana Amerîkayê hatin dayîn. Ji ber vê jî wateya van daxuyaniyan bêtir balê kişand ser xwe. Erdogan roja 7'ê kanûnê dê bi vexwandina fermî ya Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama biçe serdana Washingtonê. BRUKSEL

## 30 baskî hatin girtin

Polîsên Îspanyayê operasyonek li dijî ciwanên Baskê li dar xist û di encama wê de 30 ciwanên baskî hatin binçavkirin.

Li gorî nûçeya ku di radyoya Ispanyayê de derbas bû polîs li herêma Baskê li bajarê Navarre li dijî şaxa ciwanan a rêxistina Segi operasyonek daye destpêkirin û li 30 cihên cuda serdagirtin çêbûne. Hate îdiakirin ku vê rêxistinê têkiliya wê bi rêxistina ETA'yê ku ji bo serxwebûnê têdikoşe heye.

Her wiha polîsan berpirsiyariya çend çalakiyên bi molotofkoktêlan jî avêtin ser milê baskê ciwanan ê rêxistina Segi ya Baskê.

Piştî ku hevdîtinên di navbera hikûmeta Ispanyayê û rêxistina ETA'yê bi neyênî bi dawî bûn zextên hikûmetê yên li ser baskiyên ku serxwebûna xwe dixwazin zêde bû. Di her du salên dawî de gelek rêxistin û komele hatin qedexekirin û gelek kes hatin binçavkirin. MADRÎD

# DYA bi Talîbanê re rûdine

Amerîkayê piştî ku li Afganistanê hêviya xwe ya serkeftinê winda kir Wezîra Karên Derve ya Amerîkayê Clintonê diyar kir ku ew amade ne ku bi rê û rêbazeke maqûl bi Talîbanê re dest bi hevdîtinê bike.

Her diçe hêzên NATO'yê li Afganîstanê windahiyên mezin dide. Ev di nav welatên endam ên NATO'yê de dibe sedema fikara têkçûnê. Herî dawî Wezîra Karên Derve ya Amerîkayê Hillary Clinton, diyar kir ku ew jî bo hevdîtina bi Talîbanan re amade ne. Clinton, her çiqasî, hevdîtina bi Talîbanê re mijareke hesas bi nav kiribe jî, got ku ew, li ser hevdîtin û çareseriya pirsgirêka Talîbanê bi desthilatdariya Afganîstanê re hevdîtinan dike.

Tê zanîn ku berî niha Fermandarê Hêzên Amerîkayê yên li Afganistanê Orgeneral Stanley McChrystal, ji desthilatdariya Amerîkayê xwestibû ku 40 hezar eskerên din jî bişînin Afganîstanê. Daxwaza fermandarê Amerîkî McChreystal hê ji aliyê Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama ve nehatiye pesendkirin. Lê li gor agahiyên hatin bidestxistin fikarên têkçûna Afganistanê li pêşiya biryardayîna Obama astenga herî mezin e. Obama dixwaze welatên din jî hevkariya vê daxwazê bikin û leşkeran bişînin. Li ser Tirkiyeyê jî zext heye ku leşker bişîne Afganistanê.

**4 leşker hatin kuştin**

Berdevkê NATO'yê der barê şerê li Afganistanê de agahî da û diyar kir ku, di êrîşa mîlîtanên Talîbanî de 4 leşkerên Amerîkayê hatine kuştin. Li Kandeharê jî 5 leşkerên din ên Amerîkayê bi teqandina bombeya qeraxê rê pêr hatibûn kuştin. Ev windahî wek nîşaneyên têkçûna NATO'yê tên nirxandin û her diçe di nav raya giştî ya Amerîkayê de bertekên dijberê şer bilintir dibin. QABÎL

## Li Îngilistanê doza Iraqê dest pê kir

Li Îngilistanê duh doza li ser destpêk û encama şerê Iraqê dest pê kir. Tê gotin ku girtina biryara dozvekirinê di nav nifşê dawî yê Îngilistanê de biryara herî bi nîqaş e ku hatiye girtin. Bi vê dozê armanc ev e ku komîsyona lêpirsînê diyar bike da kîjan rayedarên Îngilistanê biryar dane û Îngilistan tevî vî şerî kirine.

Her wiha dê ev doz di nav 6 salên dagirkirina Iraqê de pêkanînên polîtîk û şerên li Iraqê jî bidarizîne. Di nav van siyasetmedaran de Serokwezîrê demê yê Îngilsatnê Tony Blair jî heye. Komîsyonê duh polîtîka Îngilistanê ya beriya şerê Iraqê girt dest. Serokê Komîsyonê burokratê teqawit Sir John Chilcott piştî daxuyaniyê pirsên der barê demê de hatine amadekirin ji rayedarên bilind ên demê kir. Lê hê ne diyar e ku çi bersiv hatin girtin. Chilcott destnîşan kir ku komîsyon tu kesî neparêze. LONDON



**Feleknas Uca**

feleknasuca@web.de

## Êzîdiyên Ermenîstanê -I-

Çûyina min a Ermenîstanê ya destpêka meha mijdarê bû sedema nirxandin û dîtinên min ên nû li ser kurdên êzîdî.

Civînên li herêma Elegez û Oktonberyan bi gel re hatin lidarxistin, dîtinên min dewlemendtir kirin û rengên civaka kurdên êzîdî ya Ermenîstanê careke din dan ber çavan.

Di civînan de zêdetirîn pirs li ser grûbên aştî yên ku ji başûrê Kurdistanê hatin bakurê Kurdistanê bûn. Tiştê ku di civînan de bala min kişand, meraq û baldariya ser bûyerên li welatê kurdan diqewimîn bû.

Ermenîstan li min wek welatekî kurdan xuya kir. Hemû pirs li ser welatê kurdan, li ser Mezopotamya an jî li ser Mezra Botan bûn.

Em zêdetirîn li ser parçebûna kurdên êzîdî rawestiyan.

Her çiqas kurd gelê herî kevintir ê Mezopotamyayê be jî, ev gel herî zêde hatiye parçekirin û hîn jî di bin nîrê dagirkeran de dijî. Êzîdî jî wek parçeyekî vî gelî, ducar hatine pelişandin û di nav xwe de jî hatine parçekirin.

Lê beşdarên civînan jî her dem anîn ser ziman ku, kes nikare êzîdiyan ji nasnameya xwe dûrxe. Lîstikên ku li ser gelê kurd tên lîstin tu car nikarin bi ser bikevin.

Mijareke awarte jî li ser rewşa kurdên li Ewropayê bû ku; ka kurdên êzîdî li Ewropayê çawa dijîn?

Berpirsiyarên senaryoya dûrkirina êzîdiyan ji kurdan û ji xwe kî ne?

Lê di danûstandinan de aîdiyeta hîmê qedîm yê gelê kurd û welatê Kurdistanê hate aşkerekirin. Çi hewldan û lîstik nikare êzîdiyan ji gelê kurd biqewirîne.

Êzîdî tenê dikarin li hember hemû lîstikan bibin keleha yekîtî û biratiyê. Parastina ziman û çand dikare li hember hemû lîstik û planên parçekirinê bibe zemînê serkeftinê.

Di heman demê de, di hemû civînan de hat xuyakirin ku, armanca komkujiya Şengalê veqetandina hîmê Kurdistanê bû.

Li hember teqînên Hewlêr û Mûsilê hişyarbûneke zindî hate nîşandan.

Lê di hemû civînan de çavên gelê êzîdî li ser Şengalê bû: Her kesê dizanîbû ku li Şengalê ligel komkujî û wêrankirinê berxwedana kurdên êzîdî berdewam e.

Kurdên êzîdî li dijî 72 fermanan jiyana xwe domandine û fermana 73'yemîn li Şengalê jî nekarî berxwedana jiyanê ya êzîdiyan bi dawî bîne.

Hîmê êzîdiyatî li ser axa Kurdistanê dê her bijî; êzîdî hîmê Kurdistanê ne.

Hêviyeke geş li ser grûbên aştiyê, yên ku li ser banga Serokê Kurd Abdullah Ocalan vegeriyabûn, hebû.

Lê bêguman hêvî bi pir pirs û pirsgirêkên paşerojê re jî girêdayî bûn. Li gor beşdarên civînên kurdên êzîdî li herêma Elegez û Oktonberyan, divê kurd berpirsiyariyên xwe yên dîrokî bînin cih û tenê yekîtî û berxwedan dikare jiyana kurdan ji nû ve bike perdarê rengê hêşîn.

www.arsivakurd.org

# Ji YJA'yê daxuyaniya 25'ê mijdarê

Koordîsayona Yekîtiya Jinên Azad (YJA) bi daxuyaniyeke aşkera kir ku pirsgirêka azadiyê ne tenê pirsgirêka jinan e. Divê zilam jî pirsgirêka xwe ya koletiyê çareser bike û têkoşîna azadiyê bimeşîne. YJA'yê bi munasebeta 25'ê Mijdarê bang li hemû jinan kir û xwes jin derkevin qadan.

Koordinasyona YJA'yê bi munasebeta 25'ê Mijdarê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hemû jinên ku rastî şîdetê hatine, bûne qurbana çanda tecawîz û şîdetê û hatine qetilkirin hatin bibîranîn. Her wiha hate gotin ku ew ê têkoşîna xwe ya li dijî sîstema desthilatdar a zilaman bidomînin.

YJA'yê daxuyand ku 25'ê Mijdarê li ser esasê qetilkirina 3 xwîşkên Komara Domînîkê derketiye holê lê divê wetaya vê rojê li ser esasê têkoşîna li dijî hemû şîdetan bê pêşxistin.

Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Em weke YJA şîdeta ku çanda sîstema desthilatdar a 5 hezar salan derxistiye holê şermezar dikin. Em bang dikin ku hemû jin û zilam bi îdeolojiya azadiyê xwe rêxistin bikin û têbikoşin. Civakên ku xwe ji zayendparêziyê rzgar nakin dê tu caran azad nebin. Ew ê her tim sîstema desthilatdar a ku keda wan nabîne li ser piyan bigirin. Ancax bi têkoşîna li hemberî vê sîstemî dê serkeftin bê. Li ser vê yekê em çalakiyên heta niha hatine pêşxistin silav dikin. Divê hemû jin derkevin qadan û nerazîbûnên xwe ya li hemberî sîstemê nîşan bidin. Em biryara grevê ya kedkaran jî pir watedar dibînin û piştgiriyê didin." BEHDÎNAN (ANF)




# Dewlet li dijî şîdetê bêdeng e!

Çalakiyên jinan ên bi munasebeta 25'ê Mijdarê didomin. Li Amedê endamên DOKH'ê daxuniyek dan çapemeniyê. Jinan şîdeta li dijî jinan şermezar kir û daxuyandin ku dewlet li dijî şîdetê bêdeng dimîne

NAVENDA NÛÇEYAN / AMED

Li Amedê Tevgera Jinan a Demokratîk û Azad (DOKH) daxuyaniyek da çapemeniyê. Li ser navê DOKH'ê Perihan KAYA, li ber deriyê Qesra Dadê ya Amedê daxuyanî xwend. Parêzvana Mafên Mirovan Reyhan Yalçindag, Endama Meclîsa Partiyê û Komiyona Hiqûqê ya DTP'ê Meral Daniş û bi sedan jin beşdarî daxuyaniyê bûn. Di daxuyaniyê de jinên endamên Meclîsa Jinan a Bajar a Amedê pankartekê ku li serê "Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa em azadiya me ye" nivîsandiye hildan.

Endama DOKH'ê Perihan Kaya dest nîşan kir ku bi salan e mafên jinan tên bin pê kirin û wiha axivî: "Ji ser bûyera xwîşkên Mirabel 49 sal derbas bûn. Lê ev zihneyet ne ya 49 salan berê ye û 5 hezar sal e li ser jinan zext û zordarî hene. Îro li çar aliyê cîhanê de jin tên pelçiqandin. Mafên jinan ên tendurustî, xebat, azadiya aborî û heta mafê jiyanê jî ji destên wan tên stendin. Tiştê balkêş jî ew e ku dewlet li dijî van kesên ku şîdetê dikin tu tiştekî nake."

**'Şer şîdetê zêdetir dike'**

Perihan Kaya, bal kişand ser erdnigariyên ku bi salan e şer lê tên kirin jî û wiha pê de çû: "Li her derê cîhanê zextên li ser jinan bi awayekî zelal tên xuyakirin. Lê dîsa em dizanin ku li cihên şerên çekdarî û pevçûn lê diqewimin, jin zêdetir tên pelçiqandin û şîdeta li dijî wan jî zêdetir dibe. Dîsa jina kurd êşekê gelek mezin kişandiye. Ev çend sal in di vî şerê de jinên kurd, hevser, law, qîz, xwîşk û birayên xwe winda kirine. Hinek dayîk hene ku gora zarokên wan jî tune ne. Jinan ji bo azadiya xwe bedêlên gelek mezin dane."

Kaya li ser polîtîkayên dewletê yên li ser şîdeta li dijî jinê û anî ziman ku ji ber vê bêhiqûqiya dewletê şîdeta li dijî jinê zêdetir dibe û wiha got: "Gelek kes ji ber şîdeta li dijî jinan tên binçavkirin lê ji ber bêhiqûqiya dewletê, şîdeta li dijî jinê rewa tê dîtin. An cezayên gelek kêm didin şîdetkaran an jî wan efû dikin."

Perihan Kaya bi lêv kir ku ji ber bêdengiya dewletê şîdeta li dijî jinê derketiye asteke gelek bilind û wiha pê de çû: "Tenê di 7 mehên dawî de 953 jin li ser navê 'parastina namûsê' an ji aliyê hevserên xwe yan jî ji aliyê malbata xwe hatine qetilkirin. Dîsa di sala 2009'an de di wekheviya jin û mêran de Tirkiye di nav 130 welatan de bûyeê yêm 125'emîn. Her wekî din ji ber ku dewlet li jinên bi şîdetê re rû bi rû mane xwedî dernakeve, jin pirsgirêkên gelek mezin ên derûnî dijîn. Ji van jinan hinekî çareseriyê di întexarê de dibînin. Dîsa li Tirkiyeyê ji ber nasnameya wê ya siyasî gelek jin bi tacîzên fizîkî û derûnî, gef, astengî û girtinan re rû bi rû dimînin."

**Dê biçin parlamentoyê**

Perihan Kaya herî dawî diyar kir ku dê ji bo van zextên li ser jinan bên rawestandin dê biçin parlementoya Tirkiyeyê û axaftina xwe wiha bi dawî kir:

"Em ê biçin parlamentoyê. Em ê xwestek û rexeneyên xwe bînin ziman. Em wekî DOKH dizanin ku jinên kurd heta niha gelek bedêlên mezin dane. Em ê di vê berpirsyariyê de tevbigerin. Em ê di xebatên xwe de hewlbidin xwe ku layiqî kesên ku ji bo azadiya jinan jiyana xwe ji dest dane, bibin."

Piştî axaftinê jin, bi durişmên 'Jin jiyan azadî' û 'Bila destên dirêjî jinan dibin bişkên' berz kirin û belav bûn.

## Afîşên '25'ê Mijdarê' daliqandin

JINAN LI navçeya Wêranşarê ya Rihayê, bi boneya 25'ê Mijdarê, Roja Piştevanî û Têkoşîna li dijî Şîdeta Navneteweyî ya li Hemberî Jinê, afîş daliqandin.

Endamên Meclîsa Jinan a Wêranşarê û rêveberên jin ên DTP'a navçeyê, li gelek deverên cuda yên navçeyê afîşên ku şîdeta li hemberî jinê vedibêjin daliqandin. Jinan bang beşdariya panelên ku dê lidarbixin jî kir û ji zilaman xwestin hevserên xwe bînin panelan. Jin, dê der barê 25'ê Mijdarê Roja Piştevanî û Têkoşîna li dijî Şîdeta Navneteweyî ya li Hemberî Jinê, çalakiyên cur bi cur pêk bînin. RIHA

# Dewletê samîmî nabînin

Jinên kurd ên di encama koçberiya neçarî de hatine li Edeneyê cih bûne di konên ava kirine de di nav şert û mercên giran de jiyana xwe didomînin. Jinên kurd ku bi mixabin, êş û hestên xwe tev li hêviya vegera gund dikin, li benda vegera gundan e. Jinan bal kişandin ser polîtîkaya hikûmetê û anîn ziman ku ji ber bêsamimiyetê ev hêviyên wan kêm dibin.

Jinên kurd ên di encama koçberiya neçarî de hatine li Edeneyê cih bûne û li cûyên avadaniyê yên DSÎ'yê yên li gundê Karagoçera navçeya Tuzlaya Edeneyê dixebitin. Jinên di konên ava kirîn de jiyana xwe didomînin, rastî gelek pirsgirêkên jiyanî tên. Jinên di seatên sibê zû de tên serkar heta êvarê bênavber xebatê dimeşînin. Ji van jinan yek jî Narinç Gunduz a 20 sal in di van konan de dijî ye. Gunduz ligel malbata xwe ya cerdevanî qebûl nekirî û ji bajaroka Dêrgula Şirnexê hatiye li Karagoçerê cih bûye. Gunduz bi gotina, "Leşkeran nehişt em tiştek hildin. Tevan benzîn rêtin ser û şewitandin" dest bi serpêhatiya xwe ya koçberiyê dike.

Gunduz ku niha 7 zarokên we hene, li zeviyan dixebite û hewil dide debara malbata xwe bike. Gunduz diyar kir ku niha wekî heqdestê rojê 18 TL'an digirin. Li derdorên konên me coyên avê hene. Di rojên baranê de jî em ji ber lehiyê ditirs in. Gunduz diyar kir ku dixwazin êdî vegerin gundê xwe û wiha domand: "Em li gundê xwe bûne me ev qas rezalet nedikişand. Em nîqaşên çareseriya pirsgirêka kurd dişopînin. Lê dewlet naxwaze ser biqedîne. Ji ber vê yekê hêviya me ya vegerê kêm dibe."

Azîme Metîn jî ji heman gundî koçberî xeribiyê bûye. Metin ev tişt gotin: "15 sal berî niha em ji ber zilmê reviyan. Em li vir cih bûn lê niha em eziyetek din jî dikişînin. Hêviya me cardin vegera gundan e. Lê wisa xuya ye ku dewlet dest ji israra kuştinê bernade." Sakîne Demîr, Bedriye Korkmaz, Halîme Gundu jî xwedî heman serpêhatiyê ne li benda vegera gundan in. EDENE (DÎHA)

Mamoste Xemrevîn
mamoste_birtane@hotmail.com

## Salek bi dawî bû...

Tevgera Jinên Azad û Demokratîk ji bo ku balê bikişîne şîdeta li hemberî jinan, par, sala 2009'an wekî sala balkişandina vê mijarê diyar kir û ji destpêka salê heta niha bênavber çalakiyên xwe yên di vî warî de domand.

Li hemû deverên ku jinên kurd lê bûn çalakiyên cur bi cur hatin lidarxistin. Jinên kurd di hin çalakiyan de jî xwestin bi jinên din ên wekî tirk, ereb, laz, çerkez, ermen û hwd. bên bal hev. Ev çalakiyên bi jinên din re her çiqas xurt derbas nebin jî di qonaxekê de gihîştin armanca xwe. Lê çalakiyên ku jinên kurd xwe bi xwe li dar xistin, hêjayî nirxandinên erênî ne. Ji ber ku jinên kurd bi rastiya xwe û ya jiyanê hesiyane, di kîjan rewşên ku neheqî li wan û kesên din bê kirin, di demê de bertekên xwe nîşan didin. Lê, di çarçoveya plansaziyên çalakiyan de, di mîtîngan de beşdariya jinan qasî ku dihat xwestin çênebû. Der barê qelsiya mîtîngan de hin nîqaş hene. Lê divê mirov vê rewşê baş binirxîne ka ji bo çi ev qelsî derketine holê?

Wekî ku hemû cihan jî pê dizane ji ber rewşên awarte ku gelê kurd her rojên xwe bi çalakiyan derbas dike û her roj li ser piyan e. Ev yek jî dibe sedema netevlêbûna mîtîngan. Ji bo vê jî, kesên ku plansaziya van çalakiyan dikin, divê vê rastiyê jî bigirin ber çavan û li gor wê reng û şiklên çalakiyan diyar bikin. Ji bo ku beşdarî xurt bibe û raya giştî de deng vede, yek an jî du mîtîngên giştî dê bes bin.

Plansaziyên ku ji bo sala 2009'an hatibûn kirin yek bi yek pêk hatin; panel, semîner, civîn, bernameyên televîzyonan û mîtîngan di raya giştî de deng vedan. Di 25'ê Mijdarê Roja Hevgiriya Jinan û Têkoşîna li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinan a Navneteweyî de heta îsal gelek çalakî pêk dihatin. Jinên ku rastî şîdetê dihatin di vê rojê de xwe tev li çalakiyan dikirin. Lê gava ku vedigeriyan malên xwe dîsa bi şîdetê re rû bir û diman. Jina ku haya wê ji gelek rastiyên jiyanê çêdibû, mecbûr dima ku mafên xwe biparêze, lê wê gavê jî rastî şîdeteke nû dihat. Tevgera Jinên Azad û Demokratîk jî ji vê pratîka hanê sûd wergirt û ne tenê rojekê ji bo salekê biryareke ku bala raya giştî bikişîne girt. Bi rastî jî jinan bi hemû çalakiyên xwe bala gelek kes û derdoran kişandin; bi giştî jî bala zilaman, zilamên ku vê tundiyê pêk tînin. ..Lê hê jî dem lazim e û xebateke domdar dixwaze ku mirov bibêje jin gihîştin armanca xwe…

Ji ber ku şîdet ew qas sîstematîze bûye ku mirov êdî nizane ku çi şîdet e, çi jî nîn e. Di gelek liv û tevgerên mirovan de wekî qîra reş pê ve zeliqiye û hûn nikarin ji jiyanê biqetînin û biavêjin. Ji zarokên heft salî heta kesên heftê salî hemû kêm an jî zêde şîdetê pêk tînin. Gelek kes şîdetê tenê wekî ya fizîkî dizane û haya wan ji cureyên şîdetê yên din tune ye. Em dizanin ku jin bi her awayî rastî şîdetê tên. Şîdeta psîkolojîk a ku jin pê re rû bi rû dimînin di nav civakê de bi tu awayî nayê dîtin, an jî wekî şîdet nayê hesibandin. Her wekî ya cinsî û ya aborî jî…

Di xebatên ku heta niha hatine kirin de her tim perwerdehiya jinan derketiye pêş. Lê tişta ku tê jibîrkirin, şîdetê zilam pêk tînin û divê di serî de ew perwerde bibin. Di plansaziyên van çend salên dawî de hêdî hêdî bi civînên qehweyan bala zilman tê kişandin. Gelo tenê bi çend civînên li qehweyan zilam dê perwerde bibin an divê şiklê xebatên perwerdehiyê bên guherîn? Ji ber ku şîdet pir sîstematîze bûye, ev xebat bi vê şiklê têrî nakin. Perwerdehiyên wekî malbateke demokratîk çawa dibe, mafên kesan ên di nav malbat û civakê de çi ne, di nav malbatê de wekheviya cinsan çawa çêdibe, her yek bi serê xwe mijarên perwerdehiyê ne. Lê dê çawa çêbibe divê rê û rêbazên wê jî bi gelekî kûr û berfireh bên niqaşkirin û diyarkirin. Hûn nikarin ji bo perwerdehiyê ferdên malbatê û zilaman di salonan de bînin bal hev, lê mirov dikare bi riya çapemeniya dîtbar xwe bigihîne wan.



**Cemîl Bayik**
der barê pergala Rêberê Gelê Kurd de wiha got: “Wek alternatîfa pergala kapîtalîst, pergala konfederalîzma demokratîk daniye holê”



‘Sermayeya global dema dest bi jinûve sazûmankirina cîhanê dike, li hemberî vê projeyê astengiya herî mezin Rêber Apo û PKK’ê dibîne’



‘Bi pêşengiya Rêber Apo li Kurdistanê şoreşa siyasî, civakî, çandî, zihniyet û demokratîk pêk hat. Di civaka kurd de ronakbûnek derxistiye holê’

# Kurd pêşeroja xwe di PKK’ê de dibînin

NALÎN DÎCLE-QENDÎL - ANF

ENDAMÊ Konseya Rêveber a KCK’ê Cemîl Bayik di hevpeyvîna xwe de bal kişand ser vejîna neteweyî 27’ê Mijdarê û planên tasfiyekirina PKK’ê û wiha got: Bi pêşengiya Rêber Apo têkoşîna hatî pêşxistin qasî ku bandor li civaka kurd û gelê kurd kiriye, ew qas jî bandor li ser gelên Rojhilata Navîn kiriye. Qasî ku bandor li dewletên mêtinger kiriye; ew qas jî bandor li sazûmanên paşverû yên Rojhilata Navîn û pergala kapîtalîst ku li Rojhilata Navîn hatiye avakirin jî kiriye.



Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Cemîl Bayik 31’emîn salvegera damezirandina PKK’ê nirxand û got PKK’ê vejîna netewî daye çêkirin. Bayik planên tasfiyekirina PKK’ê jî nirxand got hewldanên pûç in, ji ber ku PKK bûye malê gel û mirovahiyê

***▸ Têkoşîna PKK’ê li ser siyaseta hêzên cîhanî ya der barê kurdan û siyaseta hêzên mêtinger de çawa bandor kir?***

Rastiya Rêber Apo û PKK’ê tenê ji bo gelê kurd û civaka kurd guhertinê rave nake; çiqas ji bo gelê kurd û civaka kurd guhertinê rave dike, di heman demê de jî di milê siyaseta Rojhilata Navîn û cîhanê de guhertinên mezin rave dike. Ji ber ku di pêşxistina siyaseta teror û nijadkujiya li Kurdistanê tê meşandin ji mêtingeran zêdetir; pergala cîhanê ya kapîtalîst berpirsyar e. Ji ber ku di bingeh de yê ku teror û nijadkujî pêşxistiye ev sîstem bi xwe ye.

Rêber Apo û tevgera PKK’ê dema ku li Kurdistanê dest bi hewldanên têkoşîna jiyanek azad û demokratîk dikir; hîn di destpêka xebatê de bala van hêzan kişand. Ji bo wê jî di destpêkê de nûnerên pergalê ji nêz ve bi PKK’ê re mijûl bûn. Ketin nava hewldanan ku her tim çawa vê tevgerê bêbandor bikin û çawa sazûmana xwe ya teror û nijadkujiyê li ser lingan bigirin.

***▸ Hêzên Kapîtalîst çima PKK’ê ji xwe re wek asteng dibînin?***

Têkoşîna jiyana azad û demokratîk ya li Kurdistanê tê meşandin; têkoşîna afirandina civakeke nû, kesayeteke nû ye. Têkoşîna PKK’ê qasî ku bandor li dewleta tirk û hêzên mêtinger kiriye; ew qas bandor li pergala kapîtalîst û nûnerên wê yên sereke jî kiriye. Pergala kapîtalîst, ji bo têkoşîna bi pêşengiya Rêber Apo ve tê meşandin bi ser nekeve her tim li dijî PKK’ê û rastiya Rêber Apo sazûmanên mêtinger di milê siyasî, leşkerî, ekonomîk, diplomasî de destekek pir xurt daye. Di Kurdistanê de bi rêxistinkirina kurdên hevkar; xwestine pêşketina PKK’ê û di pêşengtiya PKK’ê de li Kurdistanê pêşketinên ku çêdibin asteng bikin. Dixwestin bi destekirina dewleta mêtinger a tirk û bi tecrîdkirina PKK’ê di qada navneteweyî de têkoşîna di xeta Rêber Apo de tê meşandin bêbandor bikin. Ji ber ku di hemû hewldanên xwe de serneketin û ji ber ku her tim xeta Rêber Apo û PKK’ê pêş ket, herî dawî mecbûr man ku Komploya Navneteweyî pêş bixin. Bi Komploya Navneteweyî xwestin ku hewldanên têkoşînê bêbandor bikin.

Bi pêşengtiya Rêber Apo têkoşîna hatî pêşxistin qasî ku bandor li civaka kurd û gelê kurd kiriye, ew qas jî bandor li ser gelên Rojhilata Navîn kiriye. Qasî ku bandor li dewletên mêtinger kiriye; ew qas jî bandor li sazûmanên paşverû yên Rojhilata Navîn û pergala kapîtalîst ku li Rojhilata Navîn hatiye avakirin jî kiriye. Bi taybet pergala kapîtalîst bi komploya li ser Rêber Apo dayî meşandin pêvajoya destwerdana Rojhilata Navîn da destpêkirin. Ji ber ku sermayeya global dema dest bi ji nû ve sazûmankirina cîhanê dike, li hemberî vê projeyê astengiya herî mezin Rêber Apo û PKK’ê dibîne.

***▸ Li dijî PKK’ê hemû hêzên navneteweyî desteka hêzên mêtinger dikin. Hûn van îtifaqan çawa dinirxînin? Çima ev qas PKK’ê hedef dikin?***

Di pêşengtiya Rêber Apo de têkoşîna ku hatiye destpêkirin, pergala statûkoperest ya ku xwe dispêre dabeşkirina Kurdistanê, dengeyên ku li ser înkar û îmhaya gelê kurd xwe dide avakirin tehdît kiriye û berjewendiyên pergalê jî bi xeterê re rû bi rû hiştiye. Ji ber ku berjewendiyên pergalê xistiye xeterê, her tim li dijî Rêber Apo û PKK’ê hêj di destpêkê de hêzên mêtinger destekkirine. Têkoşîna azadî û demokratîk ya ku bi pêşengtiya Rêber Apo ve hatiye pêşxistin rastiya pergalê, hevsengiya ku pergalê ava kiriye û mêtingeriya ku paşverûtiya Rojhilata Navîn xwedî dike derxistiye holê.

Eger ku pergalê kompleyek di asta navneteweyî de peş xistiye ev jî ji ber vê ye: Ji ber ku PKK’ê ji xwe re wek asteng dibînin. Ji ber ku xeta PKK’ê xeter dîtin ji bo bêtesîrkirina vê xetê hêzên mêtinger destekkirin. Lewra di pêşengtiya Rêber Apo de tevgera PKK’ê ya ku hatiye pêşxistin tenê ji bo gelê kurd tevgera demokrasî û azadiyê nîne, di heman demê ji bo gelên Rojhilata Navîn û mirovahiyê tevgereke azadî û demokrasiyê ye. Îro Rêber Apo di milê bîrdozî, felsefîk, di asta ramanê de fikra ku pêş xistiye û kûr kiriye tenê di asta çareserkirina pirsgirêkên gelê kurd de nîne, vê jî derbas dike, ramaneke ku ji pirsgirêkên demokratîkbûnê yê gelên Rojhilata Navîn dijî re dibe çareserî, heta vê jî derbas dike, ji pirsgirêkên demokratîkbûnê ya ku mirovahî dijî re dikare bibe bersiv. Ramana ku Rêber Apo daye peşxistin îro gihiştiye asta gerdûnî. Tenê di asta ramanê de namîne, her ku diçe pratîk dibe. Her ku diçe xwe bi pergal dike. Wek alternatîfa pergala kapîtalîst, pergala konfederalizma demokratîk daniye holê. Bi pêşxistina ramana Konfederalîzma Demokratîk nîşan daye ku mirovahî dê pirsgirekên xwe bi kîjan pergalê çareser bike.

***▸ PKK’ê di civaka kurd de ji aliyê çandî, civakî, siyasî ve çi guhertin çêkirine?***

Mêtingerî neteweyek ku vîna wê hatibû şikandin û ji rastiya xwe direviya ava kiribû. Tenê ji gelê kurd re, derfetên hebûna xwe fizîkî bidomîne hatibû hiştin. Ne hest, ne raman, ne çalakiyek aîdê wê nemabû. Tiştê ku jê re dihat dayîn hest, giyan, raman, rêxistin, jiyan, exlaqê, çand û kesayeta mêtingeriyê bû. Rêber Apo ev rewş guhert. Rêber Apo bi pêşxistina ramaneke mezin dest bi kar kir. Ji bo pejirandina vê jî kedeke mezin da, heta ku bi kurdan da pejirandin. PKK’ê gelê kurd ji rewşa li ber mirinê derxist û anî roja me ya îro.

Ji ber ku vîna wê şiketibû. Êdî hêviyên wê ji pêşerojê nemabû. Ji bo wê gelekî hatibû rewşeke ku rastiya xwe winda kiriye û heta ji rastiya xwe direvî. Hewl dida rastiya hêzên cihê bijî. Ji ber ku tenê ji gelê kurd re hebûna xwe ya fizîki domandin hatibû hiştin. Mirovê kurd ancax hewldana hebûna fizîkî dida. Bi navê kurdîtiyê çi hebe hemû ji kurdan hatibû girtin. Ji kurdan re tirkbûn, erebbûn û farsbûn ferz dikirin. Di Kurdistanê de tiştê ku dihat pêşxistin neteweyîbûna neteweyên desthilat bû. Rêber Apo rewşa ku gelê kurd û kesayeta ku ketiyê, wek rewşeke divê jê were şermkirin bi nav kir. Diviya ku ev rewşa şermezarî ji holê hatiba rakirin. Ji bo wê, dest bi têkoşînek bêhempa kir. Gelê ku hatîbû bêbawerkirin, vîna wê hatibû şikandin, ji xwe nebawer, bêhevî, bi têkoşîna ku PKK’ê û Rêber Apo rastiya neteweyek ji xwe bawer, bi hêvî, biryar bi pêş xist.

Rêber Apo nîşan da ku neteweya kurd, mirovê kurd divê ku jixwebawer, bi derfetên xwe têkoşîn bike wê bi ser bikeve. Ancax bi têkoşînê dikare ji rewşa ku ketiyê derkeve. Da fêmkirin ku jiyan ancax dikare bi vî awayî bê qezenckirin. Ger ev nebe bi tu rengê din wê nikaribe hebûna xwe biparêze û wê nekaribe pêşerojek demokratîk û azad ava bike.

Bawer kir ku qasî têkoşînê xeyal dikare bibe rastî. Têgihiştina vê rastiyê di kesayeta kurd de moral, heyecan û coşeke mezin da afirandin. Azweriya azadiyê da pêşxistin. Qasî ku di têkoşînê de encam girt, ew qas jî bawerî bi xwe anî.

Feraseta ji xwe bawerbûn, xwe spartina heza xwe, bi hêza xwe rabûn, pêdiviyên xwe bi têkoşînê pêkanîn nehatiba rûniştandin, ev gel ji rewşa ku ketibûyê ne dikarî xwe xilas bike, ne dikarî bigihişta asta ku îro gihiştiyê. Ev nebûya di civaka kurd de demokrasî û azadî pêş nediket.

Bi pêşengtiya Rêber Apo di Kurdistanê de şoreşa siyasî, civakî, çandî, zihniyet û demokratîk da çêkirin. Di civaka kurd de hişyardarî, zanistî û ronakbûnek derxistiye holê. Felsefeya Rêber Apo hest, raman, giyana mirovê kurd guhert. Rêber Apo hest, raman, pîvan, kesayet û çanda ku dabû kurdan rûxand. Ji ber her tiştê ku mêtingeriyê dabû kurdan, kurdan ber bi tunebûnê ve dibir. Ji bo rûxandina van hemûyan Rêber Apo destpêkê ji şoreşa zihniyetê dest pê kir. Zihniyata mêtingerî rûxand li şûna wê, ramanek kurdînî ya demokratîk û azad danî şûnê.

Ger gelê kurd niha bi dirûşmên, “Bê serok, bê PKK’ê jiyan nabe” berz dike û di vir de israr dike ji ber ku gelê kurd dizane bi PKK’ê û Rêber Apo hebûna xwe ji nû vê daye avakirin. Dizane PKK’ê û Rêber Apo pêşiya tunebûna wê ya neteweyî girtî ye. Hemû nirxên neteweyî yên ku qezenc kiriye bi saya PKK’ê û Rêber Apo ye. Ji bo vê van dirûşman berz dike.

Di aliyê siyasî de rastiya mêtingeriya dewleta tirk a li Kurdistanê derxist holê û bi kurdan da fêmkirin. PKK’ê hemû lingên siyasî yê mêtingeriya dewleta tirk serobino kir. Mirov dikare bibêje tune kir. Heta aliyê siyasî yê dewleta tirk li Kurdistanê îflas kir. Di Kurdistanê de îro mêtingeriya tirk tenê aliyê leşkerî bi darê zorê, bi terorê ancax kariye xwe bidomîne, heta di warê leşkerî de jî di tengaviyê de ye. Rastiya mêtingerî di Kurdistanê de aliyê siyasî, çandî û civakî hatiye tunekirin. Di Kurdistanê de hebûna xwe ya leşkerî bi teror û darê zorê didomîne.

PKK’ê civaka kurd ya girtî û belavbûyî ji holê rakir. Hestê kurdinî, ramana kurdinî, giyana kurdinî da afirandin û yekitiya kurd da çêkirin. Feraseta herêmî ji holê rakir. Hemû egerên ku kurdan parçe dikin, sedemên ku nahêlin yekitiya kurdan çêbibe ji holê rakir. PKK’ê yekitiyek pir xurt da çêkirin.

Tevî hemû dabeşbûnên li Kurdistanê jî xeta ku Rêber Apo peşxistî li hemû parçeyên Kurdistanê bandor kir. Ne tenê kurdên her çar parçeyên Kurdistanê, kurdên derveyî welat jî bandor kir. Di kurdan de zanabûna neteweyî a demokratîk da avakirin.

***▸ PKK’ê bi kîjan rêgezê dest bi têkoşînê kir? Di milê hişmendî de çi guhertin çêkir?***

PKK’ê ji vir dest pê kir: Feraseta ji xwe bawerbûn, xwe spartina hêza xwe, bi hêza xwe rabûn, pêdiviyên xwe bi têkoşînê pêkanîn esas girt, ev nehatiba esas girtin wê ev gel rewşa ku ketibûyê dê ne dikarîbûya xwe jê xilas bike û dê ne dikarîbûya bigihişta asta ku îro gihiştiyê. Rêber Apo xebata xwe ji zihniyetê dest pê kir. Ji ber ku mêtingeran hişmendî, giyan û ramana kurdan dagir kiribû. Bi navê demokrasî û kurdîni çi heye hemû tune kiribû. Şûna wê tiştên xwe dabûnê. Neteweyîbûna xwe li ser tunekirina neteweya kurd ava kirine. Ji bo wê diviyabû ku xebat ji vir dest pê bikira. Rêber Apo ji vê dest pê kir û di vî warî de têkoşînek pir xurt a îdeolojîkî, siyasî, rêxistinî da. Ger niha gelê kurd bi dirûşmên, “bê serok, bê PKK jiyan nabe” berz dike û di vê de israr dike, ji ber ku dizane ku bi vê tevgerê, bi Rêber Apo hebûna xwe ji nû vê daye avakirin. Dizane ku PKK’ê û Rêber Apo peşiya tunebûna kurdan girt.

Di dîroka kurdan de di vê astê de cara yekem bi pêşengtiya Rêber Apo û PKK’ê yekitiya neteweyî ew qas xurt çêdibe. Di kurdan zanabûna neteweyî ya demokratîk da avakirin. Îro PKK’ê yekitiya mezin û xurt daye avakirin. Tenê raman, rêxistina û çalakiya neteweyî dernexistiye, li gel vê demokratîkbûnek xurt jî daye çêkirin. Fikir, hest û ramana kesayeta kurd guherandiye, hest û ramanek nû da qezenckirin.

***▸ Heta roja îro jî hinek hêz û derdor PKK’ê û gelê kurd ji hev cuda dikin. Heta PKK’ê ji çareseriya pirsgirêka kurd re wek asteng nîşan dan hûn van nêzîkatiyê çawa dinirxînin?***

Rêber Apo û PKK ji bo gelê kurd nirxên afirandiye tu hêz, tu kes nikare înkar bike. Mînak jina kurd a berê nedikarî ji malê derkeve, îro aniye asta ku ji têkoşîna azadiyê re pêşengtî bike. Hemû ciwan û zarokên kurd kişandiye nava têkoşîna azadiyê. Ji hemû civakê re hest û ramanên nû daye qezenckirin. Di civaka kurd de hemû rengên pêwendiyên paşverû rûxandiye li şûna wê; pêwendî, pîvanên hin pêşverû di civaka kurd de daye pêşxistin. Ji bo wê gelê kurd îro hatiya asta gelên herî pêşketî. Jina kurd hatiye rewşa jina herî pêşverû. Gelê kurd îro di têkoşîna azadî, demokratîk wekhevî ya gelan de bûye hêviyek herî mezin. Ev rastî bi têkoşîna di pêşengtiya Rêber Apo de hatiye meşandin derketiye holê. Îro gelê kurd hatiye asta ku dikare ji gelên cîhanê re pêşengtî bike. Gihiştiye asta ku ji gelê cîhanê re hêviyên mezin bide.

Em dibînin gelê kurd pêşeroja xwe di PKK û Rêber Apo de dibînê. Lewra rastiya PKK û Rêber Apo ji gelê kurd re çi îfade dike, ji gelên Rojhilat Navîn û hemû gelên cîhanê re jî heman tiştî îfade dike. Ji bo wê hemû hewldanên dijber nikarin gelê kurd ji PKK’ê û Rêber Apo qut bikin. Ji ber ku gel hemû nirxên xwe bi tevgera azadiyê qezenc kiriye. Gel jî vê rastiyê baş dizane, ger Rêber Apo û PKK qut bibe hemû nirxên ku qezenc kirî wê winda bike. Her çend hezên mêtingeh dibêje PKK cuda ye, hûn cuda ne ji PKK û Apo qut bibin jî, neteweya kurd, gelê kurd û her mirovên kurd ê bi rûmet hîn zêdetir xwedî li PKK û Rêber Apo derdikeve. Ji ber xwedîderketin li PKK’ê û li Rêber Apo, xwedîderketina li xwe ye. Eger ku gelê kurd dibêje “bê PKK, bê serok jiyan nabe, PKK gel e, PKK pêşeroje” ev ji vê rastiyê tê. Êdî tu hêz nikare PKK’ê û Rêber Apo ji dil û mêjiyê gelê kurd derxîne. Ev Rêbertî û ev tevger bûye malê gelê kurd û gelên Rojhilata Navîn û mirovahiyê. Ji bo wê hewldanên tasfiyekirina PKK’ê û hewldanên ji neditî ve hatinê PKK’ê pûç in.



# Dengbêjek ji malbata dengbêjan;

# Huseynê Farê

NAVENDA NÛÇEYAN - AMED


Wekî ku tê zanîn, di nav çanda kurdan de dengbêjî xwedî cihekî gelek girîng e. Îro jî em hem dîroka xwe ji dengbêjan hîn dibin û hem jî ji wêjeya dengbêjan sûdê digirin. Di rêveberiya leşkeran a awarte de, di darbeyan de û di cuntayan de jî dîsa dengbêjên kurd bi awayekî serkeftî çanda xwe domandine. Tu car dest ji çanda xwe ya pîroz bernedane. Li her derê stranên xwe gotine û ev çanda xwe domandine.

Dewletê li dijî dengbêjan gelek zext pêk aniye. Wekî gelek dengbêjan Huseynê Farê jî rastî îşkence û zilma dewletê hatiye. Birayê Huseynê Farê, Usivê Farê ku niha li Amedê li Mala Dengbêjan dengbêjiyê dike jiyana birayê xwe û bîranînên wî û birayê xwe bi rojnameya Rojevê re parve kir.

**Huseynê Farê ku ji malbateke dengbêj tê bi stranên 'Xalê Cemîl' û 'Têlî' şewatê li dilê mirov dixe, wekî gelek dengbêjên kurd jiyaneke zor û zehmet derbas kir û bi stranên xwe xizmetî çand û zimanê kurdî kir**

Huseynê Farê di nav kurdan de dengbêjekî navdar e û bi taybet jî li derdora herêma Amedê tê zanîn û tê hezkirin. Huseynê Farê her çiqas heta îro hindik kasetên wî mabin jî bi dengê xwe yê zîz û dilşewat hê jî tê guhdarîkirin. Herî zêde strana dengbêj a bi navê 'Xalê Cemîl' û 'Têlî' ji aliyê kurdan ve tê hezkirin.

Navê wî yê rastî Huseyîn Tutal e. Huseynê Farê, di sala 1937'an de li gundê Farê yê bi ser navenda Amedê hatiye dinê. Ji ber vê yekê jî navê wî di nav gel de wekî Huseynê Farê hatiye nasîn. Navê gundê wan bi kurdî Farê ye lê dewletê wekî hemû navên kurdî navê gundê wan jî guherandiye û kiriye Guzelkoy. Lê hêj jî di nav gel de tu kes bi Guzelkoy bi kar nayne.


Birayê Huseynê Farê, Usivê Farê jî dengbêjiyê dike

**Di 7 saliyê xwe de dest kir**

Huseynê Farê di 7 saliya xwe de dest bi dengbêjiyê kir û stran gotine. Wî gelek ji dengbêjiyê hez kiriye. Her dem li pey dengbêjan geriyaye û di demeke kurt de dest bi gotina stranan kiriye. Li ber pez, li malê, li her derê striye. Li gundê wan dengbêjekî mezin ê bi navê Hesenê Zorîn hebûye. Huseynê Farê jî her dem li gel dengbêj Hesenê Zorîn û li ber destê wî hînî dengbêjiyê bûye.

Hesenê Zorîn jî dengbêjekî xwedî nefeseke baş bûye lê ji ber bêderfetiyê dengê wî di qeydande tuneye.

Piştî ku Hesenê Zorîn jiyana xwe ji dest dide, ji bo ku stranên wî jî bi wî re neçin, Huseynê Farê xwedî li stranên wî derdikeve. Huseynê Farê tiştên ku ji wî hîn bûye ji bo xwe wekî mîras nirxandiye û ev kevneşopî domandiye. Piştî demekê Huseynê Farê li gundên derdorê hatiye nasîn. Ji gelek cihan hatine pey wî ku here ji wan re bistrê. Huseynê Farê bi vî awayî di nav civata dengbêjan de hatiye nasîn. Kesekî bi navê Omer Boga ku xwedî şîrketa kasetan e jê re kasetê derdixe. Di kaseta wî ya yekem de stranên wekî Seyîtxanê Ker, Silêmanê Ehmed, Keremê Koraxa cih digirin.

**Bi israr kurdî distrê**

Dema ku yekem albuma xwe derdixe li Amedê di salên 1980'an de rêveberiya leşkeran a awarte hebûye. Piştî ku kasetê derdixe leşker bi ser mala wan de digirin. Leşker Huseynê Farê dibin fermandariya rêveberiya awarte û li wê derê îşkenceyê lê dikin. Fermandar jê re dibêje: "Tu çima bi kurdî stranan dibêjî? Tu li Tirkiyeyê yî divê ku tu bi tirkî stranan bêjî." Huseynê Farê dibêje: "Ez kurd im û ez neçar im ku bi kurdî bistrêm. Ez bi tirkî nizanim û naxwazim stranên tirkî bêjim." Her çiqas fermandar israr bike jî dev ji gotina kurdî bernade.

**Îşkenceyê nexweş xist**

Huseynê Farê, ji ber îşkenceya li fermandariya rêveberiya awarte nexweş ketiye û heta ku jiyana xwe ji dest bide jî ew êş kişandiye. Piştî ku zextên li ser wî zêde dibin, ew mala xwe ji Farê bar dike û tê gundê Bisilmayexê. Mala xezûrê wî jî li wî gundî ye. Piştî ku 3-4 salan li cem mala xezûrê xwe dimîne koçî Almanyayê dike. Li Almanyayê 2 sal dimîne û paşê dîsa vedigere û dengbêjiya xwe didomîne. Huseynê Farê di sala 1998'an de jiyana xwe ji dest dide.



## Were Têlî Têlî Têlî...

*Were Têlî, Têlî, Têlî...*
*Hey lê lê zalimê lê*
*Ez serê sibê radibim ji xewa şêrîn bang dikim dibêjim Têlî*
*Di nava rojê de dibêjim Têlî*
*Berêvar dibêjim Têlî*
*Bi saetê, deqê û saniyê dibêjim Têlî...*
*Ji axir û kedera dilê xwe re bang dikim dibêjim Têlî...*

*Lê lê Têliyê malxirabê,*
*Wele tu hur î, boz î beyaz î*
*Xalisê muxlîs î, beyt-ul êmin î, tu kihêlî*
*Nod û neh nav û îmze li ber navê te lêketine*
*Li ber dilê min dîsa tu pir şêrînî*
*Malxirabê wele tu kihêlî*

*Tu vê sibê li qarşî çavê min sekinî*
*Ez nizanim tu qîz î, tu bûk î, tu jinebî yî*
*Ser dev û lêvên te yên bi xêlî*
*Îsal sala 7 û 8'an e dilê min li te ye*
*Tu çima ser çavê xwe ji min vedişêrî*

*Lê lê malxirabê*
*7 heb birayên te hene, 7 heb xwîşkên min hene*
*Ji bo xatirê çavên te ez ê ji te bikim berdêlî...*

## Malbateke dengbêj

*DI MALA* wan de dengêjî wekî kevneşopiyekê tê domandin. Kalikê wî, kalê wî Ûsif, bavê wî Elî dengbêj bûne û niha jî birayê wî Ûsifê Farê dengbêjiyê dike.

Heta ku ew sax bû tenê carekê birayî wî Usifê Farê stiriye. Rojekê dawetek çêdibe û Huseynê Farê jî di dawetê de striye. Paşê milet gotiye Huseyn, bila birê te jî stranekê bêje. Birayê wî nexwestiye ku stranê bêje lê li ser israra birayê xwe Ûsivê Farê ji wan re strana Seytxanê Ker gotiye. Dengê wî jî gelek xweş bûye û civatê jî dengê wî ecibandiye. Piştre Huseynê Farê ji birayê xwe dixwaze ku êdî stranan nebêje. Dibêje: "Di mala me de ez stranan dibêjim bes e, tu nebêje." Ew jî li ser gotina birê xwe dibêje: "Baş e. Ez êdî stranan nabêjim lê ger ku tu beriya min bimrî, ez dê ji bo domandina vê kevneşopiyê stranan bêjim. Di nav gel de navê malbata me bi dengbêjan hatiye nasîn û ji bo ev kevneşopî tune nebe ez dê stranan bêjim." Û êdî stranan negotiye. Heta ku birayê wî jiyana xwe ji dest daye nestiriye.

Piştî ku Huseynê Farê jiyana xwe ji dest dide, birayê wî Usivê Farê dibîne ku li civatekê çend dengêj gihîştine hev û stranan dibêjin. Ew axaftina ku di nava wî û birayê wî de derbas bûye tê bîra wî û biryar dide ku ew jî dest bi dengbêjiyê bike. Û niha jî li Mala Dengbêjan dengbêjiyê dike. Birayê Huseynê Farê, Ûsifê Farê ciwanên kurdan xwest ku li dengbêjan xwedî derkevin. Di nav ziman û çanda kurdan de roleke mezin a dengbêjan heye û ew jî dixwaze ku ev çand winda nebe. Hatina ciwanan jî wan gelek kêfxweş dike.

## Buroya Kurdî beşdarî mîhrîcanê dibe

Festîvala wêjeyî ya interliteratur, her sal pêk tê. Festîval ji aliyê 4 weqfên flamanî û gelek rêxistinên ji neteweyên cihê, ku ji wan Buroya Kurdî yek jê ye, tê pêkanîn. Di wê rojê de, li gelek deverên cihê yên Brukselê, nivîskarên cewaz, beşek ji pirtûkên xwe dixwînin û gotûbêjê bi beşdaran re dikin.

Babeta festîvalê ya îsal "De Stad" (Bajar) e. Ango, di xwendinên pirtûkan de, divê ku nivîskar di berhemên xwe yên edebî de li ser "tema" bajêr kûr bibin..

Di xwendina hin parçe ji pirtûkên ji bo zarokan bi zimanê holandî de nivîskar Cemîl Şakelî (Amanc) jî 29'ê mijdarê di saet 13.30-14.00'ê de beşdarî bernameyê dibe. **BRUKSEL**

## Li Enqereyê 'Zerdûşt wiha Ferman da' derket ser dikê



Pirtûka Frîedrîch Nîetzsche, ya ku navê jibîrkirin a "Zerdûşt wiha Ferman da" bû lîstika şanoyê û li Enqereyê hate pêşandan.

Di çarçoveya 14'emîn Mîhrîcana Şanoyê ya Enqereyê ya Navneteweyî de lîstika bi navê "Zerdûşt wiha Ferman da" ji aliyê Tiyatro Bîr ve li Navenda Hunera Hemdem hate pêşandan. Lîstika ku têkoşîna li hemberî dorgera bêyî afirîneriyê vedibêje, aliyê civakê yê wesat bi zimanekî awarte rexne dike. Lîstik, hêviyan, heskirin, dilpakî û bêrîkirina "Mirovê jor" û şikestina xeyalan lêkolîn dike. Pêkanînên teknîkî yên lîstika yek kesî ji aliyê Mehmet Oztep û Mustafa Ataş ve hatiye amadekirin. Lîstikvan Feyzullah Oztep, diyar kir ku lîstik ji pirtûka Frîedrîch Nîetzsche a "Wiha Ferman da Zerdûşt" çêkirine û xebatên xwe li Amedê meşandine. Oztep, destnîşan kir ku wan Tiyatro Bîr, di sala 1996'an de ava kirine. Oztep, anî ziman ku ji damezirandina Şanoya Bîrê û heta niha gelek lîstokvan hatine û çûne û ji sala 1996'an û heta 2009'an bi derfetên xwe ve xebatên xwe meşandine. Oztep, bilêv kir ku beriya niha lîstika Eşber Yagmurderelî ya "Dûpişk" wergerandine kurdî û wiha got: "Me lîstika Dûpişk di sezona 2006-2007'an de lîstibû."Oztep, anî ziman ku lîstika Yucel Sarpdere ya "Vatandaş Abuzer" jî wekî lîstika şanoyê amade kirine û lîstine. **ENQERE**

# Qerf û Henek









Şêx Zubêrê Kurdî
sheakhzubear@gmail.com

## Balafira bêrêzan û şewba berazan

*Balafirên tirkan ji me re nabin yar*
*Zimanê me welatê wan dike deh par*
*Dema em qala mafên xwe dikin*
*Mirûzê wan tirş dibe, dibin cirnexweş û rûsar*
*Bi zimanê teyr û tilûran anonsê dikin*
*Ji me û zimanê me bi rik in ji me re dibin neyar*
*Ew dibêjin, "Em pir in, hûn hindik in."*
*Lê ew qaşil û qalik in, em kakil û dendik in.*
*Ew cirnexweş in, em bedew û rindik in*
*Ew çi bibêjin jî em ê bi ya xwe bikin*
*Azadî li ku be em li nik in*

Belê gelî heval û hogiran. îsal jî me berê xwe da Hacerul Eswed, em ê dîsa bibin hecî. A rast îsal armanca min cuda ye. Xwedê gunehê me efû bike, min ji bo derziya şewba berazan berê xwe da Erebistana Siûdî. Lewre ez pê hesiyam ku dê serê pêşîn derziya virûskuj li heciyan bidin. Ez bi xwe ji şewba berazan pir ditirsim, lewre heke em bi vê nexweşiyê biçin, em ê bê îman biçin. Dê zebanî ji me hesabên giran bixwazin, dê bibêjin, "Çima hûn bi vê nexweşiyê ketine, ma qey we goştê berazan xwariye, li şûna goştê berazan we goştê birêzan bixwara çêtir bû." Bi xwedê qet di heyata xwe de min goştê berazan nedîtiye, lê dîsa jî heke ez bi vê nexweşiyê bikevim, kes ji min bawer nake.

A rast şewba birêzan ji ya berazan xerabtir e, lê ji ber ku her kes pê ketiye, haya kesî ji bayê felekê nîn e. Bal û dêhna xwe bidin vî bêrêzî. Hûn ê niha bibêjin, "Kîjan bêrêz", ez ji we re bibêjim, "Wezîrê Raguhastinê". Li gorî gotina wî berazî dê anonsa kurdî welatê Tirkiyeyê parçe bike. De were nemire, nebihece.

Belkî tê bîra we min carekê qala xewneke xwe ya di balafirê de kiribû. Di xewna min de di balafirê de anons bi kurdî dihate kirin. Ew xewna min encama daxwaza dilê min bû. Min pir dixwest bi kurdî jî anons were kirin. Ev ne daxwaza min tenê bû, ev daxwaza piraniya kurdan bû. Li ser navê me kurdan nûnerê me birêz Osman Ozçelîk ji bo ku vê xewn û daxwaza dilê me kurdan bi cih bîne, ev mijar di Meclisa Tirkan de anî rojevê. Lê mixabin dîsa tûşî helwesteke berazên bêrêz hat..

Piştî vê rewşê helwesta kerane, di balafiran de nebûna anonsa bi kurdî bi min ji berê dijwartir tê. Her cara ku ez li balafirê siwar dibim, li hemberî rewşê ez dîn û har dibim. Her carê piştî vê rewşê ez du seansan diçim bal Dr. Dilgeş. Ew ji min re qala têkoşîna TZPKurdî dike, dibêje, "Hinekî bêhna xwe fireh bike, xwediyê sebrê milûkê Misrê, dê TZPKurdî bibe ruhistîn asîmîlasyonê, li bendê be." Piştî van gotin û nirxandinan bêhna min tê ber min, ez hinekî bi ser xwe ve têm. Lê mixabin destmiza wî bijîşkê serîrîşk pir giran e; her seansek 200 ewro ye. Yanî piştî her seansê ez mecbûr dibim du sed caran bibêjim, "Ewro, ewro, ewro!" Destûrê nade ku ez bibêjim, "Spêde an jî duh!"

Ez çi bibêjim, bila xwedê teala ahê bizina kol ji ya biqiloç re nehêle.

Ez ê li ber Hacerul Eswed doza mafê me kurdan bikim, lê ez ditirsim ku ew ê li wir jî Beasî derkevin û bi tirkan re hevkariyê bikin.






## XAÇEPIRS

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | | ■ |
| 2 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 3 | | | | ■ | | | ■ | | |
| 4 | | ■ | | | ■ | | | | ■ |
| 5 | ■ | | ■ | | | ■ | | ■ | |
| 6 | | | | ■ | | | | | |
| 7 | | | ■ | | | | ■ | | ■ |
| 8 | | ■ | | | | | | ■ | |
| 9 | | | | | | ■ | | | |

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Notayek... Paqijkirina çandiniyê ji gihayên bêkêr **2.** Baneşana bêhntengiyê... Bazirganê ku zadî dikire û difroşe **3.** Rengê reşê dibiriqe... Pevdenga kurdî... Tevgera hewayê **4.** Cejn, eyd... Bêqiloç **5.** Nexweşiyek **6.** Xweliya piştî şewatê... Bajarekî Tirkiyeyê **7.** Notayek... Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropayê **8.** Heta hetayê **9.** Gem... Ji pêncan yek zêde

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Kesê ku di meyxaneyê de meyê digerîne... Dadwer **2.** Roja em tê de ne **3.** Newaya nivandina zarokan... Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî **4.** Dixan... Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe **5.** Orjînal **6.** Çengela ku pê masî tê girtin... Edalet **7.** Eşîr, qebîle, hoz... Boyaxa neynûkan ... Kar û xebat **8.** Çîrokên kin û piraniya wan li ser sewalan in û mirov tiştekî jê hîn dibe... Peyva neyînî **9.** Notayeke muzîkê... Kurtebêja Ksenonê... Cihê herandinê

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | C | ■ | N | A | ■ | E | B | A |
| 2 | B | Ê | R | Î | V | A | N | ■ | Z |
| 3 | A | R | A | V | ■ | L | Î | M | A |
| 4 | D | ■ | Z | ■ | D | A | ■ | A | D |
| 5 | Î | Ş | ■ | P | A | L | A | S | ■ |
| 6 | ■ | E | B | A | D | ■ | L | ■ | F |
| 7 | A | M | Î | R | ■ | N | Î | Ş | E |
| 8 | S | Î | ■ | A | R | Î | ■ | Î | D |
| 9 | A | ■ | O | F | ■ | R | E | N | Î |

## Şer û pevçûna Kalo û Pîra Fatê

Apê Hiso hem firarê leşkeriya dewleta tirkan bû û hem jî wî di temenê xwe de qet rojî û nimêj nedigirt û ne jî bi wan tiştan bawer dikir.

Îcar ji ber wan pêkanînên wî pîra Fatê gelekî ji wî aciz dibû. Her tim di navbera wan de şer û pevçûn hebû. Jixwe pîra Fatê miroveke oldar bû; rojî û nimêj dikir û ji apê Hiso re digot tu jî bigire lê wî nedigirt...

Pîra Fatê her çiqasî jineke oldar bû dîsa jî ew di jiyana rojane de jineke serpêhatî û bi xwe bawer bû. Ji xwe serdestî li ser apê Hiso dikir.

Di nava jiyana rojane de şer û pevçûna wan êdî hemû gundî û cîranan dibihîst.

Herî dawiyê pîra Fatê jê re dibêje Hiso heke tu ji nika pêve rojî û nimêjê negirî ez nema ji te re şîv û taştê çêdikim.

Li ser vê tehdîda pîra Fatê apê Hiso ditirse, dest bi nimêjê dike. Ew wê rojê dere ser kaniya gund nimêj dike hîn nimêja wî naqede, di wê navberê de leşkerê tirkan tên apê Hiso di ser nimêjê de zevt dikin û wî dibin derin qereqolê, têra wî lê dixin û jê re dibêjin tu firarê leşkeriyê yî, em ê te bişînin leşkeriyê.

Ew hetanî amedakariya şandina wî ya leşkerîyê dikin, apê Hiso riyeke xwe dibîne, ji qereqolê direve tê malê û bi awayekî acizbûyî ji pîra Fatê re dibêje, ez ji te re dibêjim nimêjê nakim nakim tu dibêjî na nimêjê bike.



Ma heke min nimêj nekira ew ê çawa leşkeran min zevt kiriba. Nika tu ji min re şîv û taştê çênekî tu dixwazî derî jî li min veneke ez dîsa rojî û nimêjê nakim û ji wê rojê şûnde apê Hiso dîsa vegeriya qeyda berê û wî êdî ne nimêj kir û ne jî rojî girt.

*Nail DEMÎR*

www.arsivakurdi.org

## Ev xwînxwar ji xwîna me têr nebûn

*Ne Topal Osman, ne*
*Alpdoxan*
*Ne Celo û Feyzo û Îso*
*Û vanên din*
*Heya vê rojê*
*Ji zilm û zordestî û*
*komkujiyê*
*Têr nebûn birao*
*Têr nabin…*

*Me 400 salan seranser*
*Serhedan xwedî kir*
*500 sal in sedaqet û rastiya*
*me didome*
*Lê van bêbaban hîç fêm*
*nekir*
*Fêm nekir birao*
*Fêm nekir…*

*Me xwe biçûk kir*
*Ev dîn û har bûn*
*Me xwe nizim kir*
*Li me siwar bûn*
*Maf mafên me*
*Heq heqên me*
*Lê tim û daîm*
*Navê isyanan,*
*paşverûtiyan*
*Û terorîstiyê*
*Li me bar bû*

***(Birayê te Şakir Epozdemîr)***




# BÎRANÎN



*Ew zordar û zalimên wehş û hov, bi hezaran zêdetir merivperwerên kurd dan qetilkirin û di vê sedsala 21'emîn de navên wan danîne "faîlî mechûl". Kurd nevan, xêrnexwaz û dijberên xwe baş nas dikin. Faîl û qatil jî dizanin ka kî ne. Wê rojek bê, ew ê serî daynin berpê, em ê doza xwe ji wan bixwazin û bigihîjîne armancê.*

*Evîndara me, her du çavên me bi milyonan kesan îro di riya ku we nîşan daye de rabûne ser piyan. Di salvegera şehadeta te ya 16'emîn de li ber hemî şehîdên rêka azadiya miletê kurd kemerbest dibin. Dibêjin şehîdên me şanazî û serfiraziya me ne. Em jî soz didin wan ku heya mecala me hebe, em ê şopa wan bidin jiyandin.*
*ŞEHÎDEN ME*
*SERBILINDÎ Û*
*RÛMETA ME NE.*

***TÊBINÎ:** **Di salvegera 16'emîn a şahadeta parêzer Şevket Epözdemir de li Tetwanê li Gorisata Karşiyakayê roja 26.11.2009 di saet 13:00'î de li ser gora xwe wê bê bibîranîn.***

**Li ser navê malbatê**
**birayê wî**
**M. Şakîr EPOZDEMÎR**

*Parêzer Şevket EPOZDEMÎR - 1993*

# Şehîdên me serbilindî û rûmeta me ne

ŞAKÎR EPOZDEMÎR

Dara azadiyê bi xwîna şehîdan tê avdan. Milet bi cehd û xebat û berxwedanên şehîd û şervan û xebatkarên bawermend û welatparêz dibine yekdest, yekmist û yekrêz. Yekîtiya miletan li ser cehd û xebat û fedekariyên bi dil û can ava dibin.

Birayê min ê ezîz û hêja Şewket Xoce, yek ji van xebatkaran bû, ku bi salan û salan ji bona yekîtî û yekbendiya kurdan tovê aştî, azadî, wekhevî û birayetiyê direşand. Ew di xizmeta xwe ya hiqûqnasiyê de, di zemanekî teng û tarî de, bû delîlê ketiyan û mezlûman. Di siyaset û xebatê de kete xizmeta berjewendiyên miletê xwe û ji bona şexsê xwe tu wextî tiştek teleb nekir. Ewî, tu wextî firq û meyl nexste navbera şivan û gavan û feqîr û zengînan. Qedir û siyaneta hemî kes û kesayetiyan girt û xwe li ser tu kesî mezin nekir. Nefsbiçûk bû, dilovan bû, muşfîq bû, beşerxweş û rûgeş bû Şewket.

Berî her tiştî insan bû. Firq û meyl nexiste navbera kurd û laz û çerkez û ereb û tirkan. Ew tenê merivperwer bû, mafperwer bû, welatparêz û azadîxwaz bû. Hûn dikarin vê rastiyê ji laz, tirk, ereb, çerkez, şêx, seyîd, ticar, karker û karmendên bajarê Tetwanê pirs bikin û bizanin ka Şewket çi bandoreke qenc li vê navçeya şîrîn hiştiye. Prêza vî hiqûqnasê bêtirs pak û paqij e.

Dijmin û nevanên wî zalim û zordest bûn, şoven û faşîst û mîlîtarîst bûn. Ewî ji despotan, zordaran, derewker û hîlebazan nefret dikir. Tawîz nedida wan zordestan û serê xwe li ber wan nişîv nedikir. Heya saniya paşî li pêşberî neyaran çik sekinî û di niqta dawiyê de kenê xwe bi aqilê wan zorbeyên mîlîtarîst kir.

Ew zordar û zalimên wehş û hov, ji 10 hezaran zêdetir xwendevan û merivperwerên kurd bi destê leşker, polîs, jîtem û ergenekona xwe ya şaş û tewş dan qetilkirin û di vê sedsala 21'ê de navên wan danîne 'failî mechul'.

Kurd neyar, nevan, xêrnexwaz û dijberên xwe baş nas dikin. Fail û qatil jî dizanin ka kî ne. "Wê rojek bê, ew ê serî daynin berpê, em ê doza xwe ji wan bixwazin."

Ez di vê êvara Cejna Haciyan de, li Tetwanê, li goristana Tetwana Kevin, li ber gora Şehîdê Tetwanê Parêzer Şewket Epozdemir kemerbest dibim û bi kemerbestî rehmetê jê re û ji wan miriyên dora wî re, bi taybet ji Şehîd Mizgîn û wan welatparêzên vî goristanî re daxwaz dikim û rêz digrim. Rojên xweş û azad ji bo miletê kurd daxwaz dikim.

Bi vê minasebetê ji Koçgirî, Dêrsim, Pîran û heya vê saniyeyê, li ber hemî şehîdên rêka azadiya miletê kurd kemerbest dibim. Rehmet û mexfiretê ji Xweda dixazim û dibêjim şehîdên me şehnazî û serbilindiya me ne. Em jî soz didine wan ku heya mecala me hebe, em ê nehêlin xwîna wan li boşê biçe.

www.arsivakurdi.org

# ROJEV

25 Mijdar 2009 Hejmar: 13 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com





# Krîza aborî karsazên pembo anîn ber îflasê

**Li Bismilê xwediyên fabrîqeyên circir û rûn diyar kirin ku çavkaniya debarê ya herî girîng pembo, ku wekî 'zêrê spî' tê pênasekirin di asteke nebaş de ye. Xwediyê fabrîqeyan gotin ku 13 fabrîqeyên li navçeyê 3 naxebitin û 10 fabrîqeyên din jî li ber girtinê ne**

Xwediyên fabrîqeyên circir û rûn yên li Bismilê, diyar kirin ku ji ber krîza aborî û ketina buhayê pembo di rewşeke ne baş de ne. Xwediyên fabrîqeyan, xwestin ku hikûmet alîkariyê bide wan. Xwediyên fabrîqeyan dan zanîn ku 13 fabrîqeyên li navçeyê 3 naxebitin û 10 fabrîqeyên din jî li ber girtinê ne.

Li navçeya Bismilê ya Amedê karê debarê yê herî girîn pemboyê wekî "Zêrê spî" tê zanîn di asteke gelek nebaş de ye. Buhayê kîloya pembo di sala 2002'yan de bi hezar û sed qurûşan bû, lê di sala 2009'an de kîlo kete 95 qurûşan. Xwediyên fabrîqeyên circir û rûn, destnîşan kirin ku buhayê pembo her sal kêm dibe û di nava 7 salan de hêj jî buhayê pembo negihiştiye buhayê xwe yê berê. Xwediyên fabrîqeyan, bilêv kirin ku demekê buhayê pembo 78 qurûş bûye lê dema ku pembo baş bibe dê qezenc bikin, lê dema ku wisan nebe dê îflas bikin. Li navçeya Bismilê 13 fabrîqeyên circir û rûn hene, lê ji ber ku pembo kêm e 3 fabrîqe naxebitin û 10 fabrîqe jî bi tenê vardiyekê dixebitin. Xwediyên fabrîqeyan diyar kirin ku ji ber krîza aborî dibe ku hikûmetê kredî dabûya cotkaran, lê her roj maliye êrîşan tînin ser fabrîqeyan û bi milyonan cezayê pere ji wan dibirin.

**'Razemeniyeke şaş'**

Xwediyê fabrîqeya circirê Teyfîk Bozçali, da zanîn ku berî hikûmet prîmên çandiniyê aşkera bikira dê cotkaran jî li gorî vê hesabên xwe kiribana û wiha got: "Alîkariya prîman a ji bo cotkaran gelek girîng e. Lê ji ber ku dereng hatiye aşkerakirin gelek cotkaran razemeniyeke şaş kiriye û zirar dîtine. Îsal buhayê pembo kêm jî be hinek baş bûn. Dema ku wisa biçe em li bendê ne ku salên pêş de çandiniya pembo zêde bibe. Dema ku buhayê pembo di vê astê de be û hikûmet jî alîkariyê bede dê qezenca cotkaran çêbe lê dema ku wisan nebe dê zirarê bikin."

**'Sîgorteya me çênakin'**

Zulkuf Oral jî anî ziman ku li navçeyê 13 fabrîqe hene lê tu fabrîqeyan sîgorte tune ye û wiha got: "Serlêdanên me yên ji bo şîrketên sîgorteyan bêencam dimînin. Dibêjin li vê herêmê rîsk heye û em ji ber vê yekê sîgorteyan çênakin. Fabrîqeyên me di bin rîskê de ne û em nikarin sîgorta bikin. Em dixwazin di vê mijarê de rayedar bi hestiyar bibin. Ji ber ku karê pembo nebaş e gelek cotkaran zeviyên xwe firotin û dest ji vî karî berdan." Midûrê Firotinê ya Fabrîqayên Circir û rûnê Nurullah Yuksel, wiha got: "Ji ber ku li navçeyê îsal tu berhem tune bû me û 2 fabrîqeyan tu kar nekir. Fabrîqeyên din jî bi tenê vardiyekê dixebitîn. Dema ku kar heba herî kêm dê di her fabrîqeyekê de 50 kes xebitiba û nanê şevê biriba mala xwe."

Yuksek, têkildarî buhayê pemboyê di nabera salên 2002 û 2009'an de bi hev re rû bi rû kir û wiha domand: "Di sala 2002'an buhayê pembo kîlo 1.100 panqunutê dihate firotin. Di sala 2004'an de 60 penqunutan dihate firotin. Ji ber vê yekê cotkarên pembo îflas kirin. Îsal jî kîloya pembo 95 panqunutan tê firotin. Yanî hej jî buhayê pembo negihiştiye rewşa 2002'an. Dema ku pembo pere neke cotkar zirarê dikin." AMED (DÎHA)

## Li Kayapinarê xebatên rê dest pê kirin

Şaredariya Kayapinarê li Kayapinarê xebatên rê dan destpêkirin. Şaredariya Kayapinarê di çarçoveya bernameya xebatên sala 2009'an de li cihên nû yên xwecihbûnê xebatên rê da destpêkirin. Cîgirê Şaredarê Kayapinarê Fevzî Yetkîn der barê xebatên ku dimeşînin de axivî û diyar kir ku zivistanê welatî pirsgirêkan dijîn û ji bo ku welatî tengasiyê nekişînin xebatên xwe bênavber didomînin. Yetkîn wiha dirêjî da axaftina xwe: "Armanca me ya yekemîn ji bo gel xizmet e. Esasa şaredartiya gel xizmet e. Ji bo sala 2009'an me bernameyeke xebatê dabû ber xwe. Ev xebatên me temam dibin. Ev xebatên me xebatên rê û parkan in. Me 12 km rê çêkir. Di demên pêş de jî dê xebatên me li herêmê bidomin." AMED



# Wesayît dê bêpere di xizmetê de bin

Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ji bo ku cejna Qurbanê bi awayî rehet û hîjyenîk derbas bibe gelek xebat dan destpêkirin. Her wiha dê di cejnê de hemû wesayîtên şaredariyê bê pere xizmetê bide.

Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ji bo cejna Qurbanê amadekariyên xwe temam kir. Sekreterê Giştî yê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Fahrettîn Çagdaş der barê xebatên xwe de axivî û ji bo serjêkirina qurbanan di serî de Borsaya Sewalan a Çarikli û her wiha 8 cihên din jî cih veqetandine. Çagdaş wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji bilî van cihên ku me diyar kirine dê destûr neyên dayîn ku sewal bên serjêkirin. Ev hem ji paqijiya hawirdorê û hem jî ji bo tenduristiya gel xeter e. Kesên ku ji bilî van cihên ku me diyar kirine sewalan serjê kin dê ceza lê bê birîn. Kesên ku van rêbazan paşguh bikin dê ewil jî aliyê ekîbên zabitayê ve bê hişyarkirin û dê wan bişînin cihên ku me diyar kirine."

**'Kontrol zêde bûn'**

Çagdaş bal kişand ser serjêkirina qurbanan û bilêv kir ku ji bo ku serjêkirin di hawirên hîjyenîk de bê kirin dê hekîmên veterîner li wir bin. Çagdaş wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em ê avê bi tankêran ji bo wan bibin. Her êvar jî dê piştî serjêkirinan hemû qad bê dezenfektekirin. Hemû bermayîn jî dê jî aliyê ekîbên şaredariyê ve bên girtin. Ligel vê di cejnê de jî dê kontrola xurekan bi awayekî rutîn bê kirin. Bi taybetî jî divê îmalatxaneyên şîraniyê, nanpêj, qesab dê zêde bên kontrolkirin."



**'Wesayît bêpere ne'**

Çagdaş da zanîn ku ji bo ku gel bi awayekî rehet di cejnê de biçin serdana goristanan wesayît amade kirine. Çagdaş wiha pê de çû: "Li ber 7 mizgeftên navendî dê roja yekemîn ya cejnê wesît gel bibe ziyareta goristanan. Her wiha dê 4 rojên cejnê jî hemû otobusên şaredariyê bê per di xizmeta gel de be."Di cejnê de ji bo rewşên wekî, şewat, lehî, xizmetê definkirinê hûn dikarin 24 saetan xwe bigihînin nimreyên şaredariyê. Di rewşên acîl de nimreyên ku hûn dikarin lê bigerin;

Alo İtfaiye: 110, Alo DÎSKÎ: 185, Alo Xeta Goristanê: 188, Alo şaredarî: 153

**Mazadên qurbanan;**

Borsaya sewalan, ligel Goristana Yenîkoyê İskanevlerî, otogara berê Seyarantepe, sahaya îkmal makîneyê.

**Cihên serjêkirinê;**

Baxçeyê Weqfa Piştevanî û Alîkariya Civakî, Tesîsên May-Can Et Entegre, Tesîsên Guler Et Entegre, Şantiyeya Fen a Deriyê Mêrdînê, Borsaya Sewalan a Şaredariya Mezin, Pazara semtê şaredariya Yenişehîrê, Weqfa Alîkarî ya Civakî ya Koşuyolu. AMED

## Pêşangeha 'UFO' li Amedê hate vekirin

Ji aliyê Navenda Lêkolîna Zanistî ya Feza Ufo SÎRÎUS li Amedê 'pêşangeha Ufo' hate vekirin. Navenda Lêkolîna Zanistî ya Feza Ufo SÎRÎUS ku li Stenbolê ye bi armanca ku agahiyên der barê fezayê de bi cîhanê û Tirkiyeyê re parve bikin li Amedê pêşangehek vekir. Pêşangeha ku li Amedê hate vekirin eleqeyeke mezin dît. Koordînatorê Projeya Navenda Lêkolîna Zanistî ya Feza û Ufoyê Kaan Cankardeş diyar kir ku armanca wan ev e ku agahiyên der barê fezayê de li cîhan û Tirkiyeyê bi konferans û pêşangehan parve bikin. Cankardeş wiha pê de çû: "Ji sala 1996'an heta niha em vê projeyê dimeşînin. Di çarçovaeya vê projeyê de me gelek pêşangeh û konferans pêk anîn. Cara yekemîn e em tên Amedê. Pêşangeha me dê 15 rojan li muzeyê vekirî bimîne." AMED (ANF)



## Şaredariya Wanê ji zivistanê re amade ye

Ji ber destpêkirina zivistanê Şaredariya Wanê bi armanca nirxandina amadekariyên zivistanê civînek li dar xist. Di civînê de hate diyarkirin ku ji bo gel maxdûr nebe dê hemû derfetên şaredariyê bixin xizmeta gel.Civîn di bin serokatiya Cîgira Şaredar Gulbahar Orhan de bi tevlîbûna Midûriyeta Fen, Hatinûçûnê û Karên Destekdayînê hate lidarxistin. Di civînê de Orhan diyar kir ku ji bo têkoşîna bi berfê re ekîbên Midûriyeta Fen û yên Midûriyeta Paqijiyê hatine peywirdarkirin. Midûrê Fenê Orhan Şenkaya, der barê amadekariyên zivistanê de agahî dan û da zanîn ku dê ji bo rê neqerisin 100 ton xwê amade kirine û eger pêwist be dê hêj jî xwê were kirîn. Şenkaya ragihand ku dê xebatên xwe bi 100 personel, 7 kamyon, makîneyek Unîmok a ku berfê paqij dike û heman demê xwê belav dike, 3 grayder, makîneyek belavkirina xwê û 2 makîneyên barkirinê li ser hezar hezar 600 kîlometre rê bidomînin. Şenkaya, daxuyand ku piştî barîna berfê dê xebatê li alterên navendî bidin destpêkirin. WAN (DÎHA)

# 'Em di golavêtinê de serkeftî nebûn'

Berpirsê şaxa Futbolê ya Kayapinar Belediyesporê Adîl Demîr diyar kir ku di maça Batman Petrolsporê de baş lîstine lê gol neavêtine û got maç berambeer ma. Demîr anî ziman ku hefteya pêş dê bi Rihayê re bilîzin û anî ziman ku dê di vê maçê de performanseke baş derxînin holê.

Kayapinar Belediyespor hefteya borî di sahaya xew de bi Batman Petrolsporê re hate hemberî hev. Di encama vê maçê de her du tîm beramber man. Niha Kayapinar Belediyesporê encamên galîbiyetê nîqaş dikin. Berpirsê Şaxa Futbolê ya Kayapinar Belediyesporê Adîl Demîr der barê maça ku pêk hatibû de axivî û wiha got:

"Di maçê de em gelek baş lîstin lê riyên golê nehatin vekirin. Em beramber man. Ji ber vê em ê ji niha de li ser riyên golavêtinê bixebitin. Hefteya pêş maça bi Şanliurfasporê re heye. Eger ku em van pirsgirêkên xwe çareser bikin, em ê bi ser bikevin. Ji lîgê re hefteyek mabû me biryar da ku em di lîgê de berdewam bikin. Ji ber vê me kadroyek baş ava nekir. Me bi ciwanên xwe yên xwemalî dest pê kir. Lê dîsa jî em serkeftî bûn. Em di maça Sîirtsporê de di deqeya 3-2 têk çûn. Lê em bi tîma xwe bawer in. Em ê baştir bin ." AMED




www.arsivakurdi.org